



FOTO:DELIL SOULEIMAN/AFP

Di medya û akademiya serdestan de **jinên Kurd ên têkoşer**

■ Lêkolîn li ser jinên Kurd û awirek li akademiye - Dilar Dîrîk

■ Bi bînavkirinê gotara Sovyetî beramberî Kurdan - Luqman Guldivê

■ Malê Mîratê: Vîs û Ramîn - erd agron

■ Hevpeyîna li gel nivîskar Sadiq Ūskan - Helîm Barîn


■ Rêxistineke çand û perwerdeyê: Gehandinî - Ardîn Dîren

■ Ji çavê nivîskarekî Elman Sureya Bedirxan - Îbrahîm Bulak

■ Murat Bektaş: Dengê wî çiyayên Kurdistanê hejandin - Kakşar Oremar

ZHANG BOWEN/AFP/XINHUA

6'ê Çileyê 2022'yan kudika hirça Pandaya Dêw li Navenda Lêkolîna Pandayên Dêw a Qingling a li Pekîne - li herêma Çîne Shaanxi - ji xwe re dilîze.



8'ê Çileyê 2022'yan firoşkarekî şekirê pembû bi bisiklêta xwe di rêyeke bajarê Efxanistanê Kandaharê re dibihure.



JAVED TANVEER/AFP/KANDAHAR



WÉNE:DELIL SOULEIMAN / AFP

Lêkolîn li ser jinên Kurd û awirek li akademiye

Beriyariya niha bi deh salan, xebatên zanistî li ser dîroka û siyaseta jinên Kurd pirr kêrhatî bûn. Îro, li gelek welatan, her sal, gelek xwendekar û mamoste dixwazin li ser tevgera jinên Kurd lêkolînê bikin. Bi taybetî ji sala 2014'an ve, bi şerê Kobanê re gelek kesên nû bala xwe didin dîroka û siyaseta jinên Kurd.

Çawa ku em dizanin, ji doh heta îro, dîroka gelê Kurd û nexasim dîroka jinên Kurd, yan nehatiye nivisandin yan jî bi destê desthilatdaran bi şiklê polîtîk hatiye nivisandin. Ji ber vê yekê, xebatên akademîk yê ku îro werin amadekirin, girîng û heja ne. Dîsa jî pêwîst e ku em vê pevajo ya nû li dîroka jinên Kurd bi çavên vekirî û rexnedar bişopînin.

Ji dehan salan ve li her devera cihanê rexneyên cuda li ser têkiliya di navbera zanist û iqtîdarê de çêbûne. Bîdestxistina fikr û ramana tevgerên alternatîf ji bo zelalkirina girêdanên wisa, girîng e. Cidîgirtina rexneyên li dijî nihêrîna pozîtîvîzmê, herwiha berxwedana li dijî aqil û zêhniyeta dewletdar, zilamsalar û kapitalîst îfade dike. Ji ber vê yekê, bipêşxistina xebatên akademîk li ser tevgera weke tevgera şoreşger a jinên Kurd, ne tiştekî hêsan e. Di herî dawî de, ev tevger bi xwe ji dehan salan ve rexneyên zanistî pêşkêş dikirin û heta îro (bi mudexelîyên wekî Jineolojîyê) nihêrînen alternatîf pêşniyaz dike. Niha, gelek kesên bi nihêrîna çepgir, feminîst, ekolojîk û anti-kolonyal hewl didin tecrûbe û tehlîlên tevgera azadiya Kurd nas û fêhm bikin.

Di eynî demê de, mixabin, sîstema neoliberal destûr nade ku zanîgeh bibin cihê ji bo lêhûrbûnê: "Tu dixwazî kariyerê xwe bi pêş bixî? Wext nîne - zû bixwîne, zû binivîsîne!" Ev rewş jî yek ji wan sedeman e ku rexneyên li ser çarçoveya pozîtîvîzma di zanistên civakî de yan zêde nayên xwendin, yan jî esas neyên girtin. Bi giştî em dikarin bibêjin, pîrrianiya lêkolînê li ser tevgera jinên Kurd, xwe bi fenomenan, lê ne bi wateyan mijûl dikin. Pîrsên wekî "Tevlîbûna jinan a

nav tevgera azadiyê bi rastî wan azad dike?" yan "Teoriya tevgera azadiya gelê Kurd li gorî pratîka wî ye?" bi xwe, ne pîrsîgîr in. Lê heger rê û rêbaza lêkolînan ne xurt bin, netîce jî ne-xurt - seresere heta şaş - dibin. Nexasim yê ku Kurdî û Tirkî (yan jî bi yekî ji wan) nizanin, arşîv, nivîs û weşanên tevgera jinên Kurd bi xwe naşopînin, lê zedêtir lêkolînên akademîk (û - bi navê objektîf-bûnê - bi taybetî yê ku bi destê mirovên nekurd tên nivisandin) wek çavkaniyên esas cidî digirin. Ev rewş bi xwe pîrsêkê derdixe holê: Fikir û zanista kê tê dîtin? Bipêşxistina zanist, nivîsandina dîroka mafê kê ye?

Xuyabûn û pîrsîgîrêkên pê ve

Pîrsîgîrêkeke din jî ew e ku xebatên akademîk ji konjunkturên siyasî ne qut in. Di dema berxwedana Rojava ya li dijî DAIŞ'ê de ragihandina cihanî bi roleke mezin rabû. Ji bo kesên ku heta îro nehatin dîtin û ji ber vê yekê zû dikevin bin bandora raya giştî, xuyabûn di asta navneteweyî de tiştekî mûze e. Wekî mînak, beriya ku hatibûn xwendin yan temaşekirin, pirtûka rojnamevan Gayle Tzemach Lemmon "Keçên Kobanê" yan jî çêkirina bernameyê li ser YPJ'ê jî aliyê Hillary Clinton ve jî aliyê gelek siyasatvan û çalakvanan ve hatiye pîrozkirin. Lê gelo çima, çiqasî ew her du xebat bi zanebûn dîroka berxwedana jinên Kurd li gorî siyaseta dewletan diguherin, nabe pîrsîgîrêk?

Qutkirina têkoşîna jinên Kurd ji dîroka xwe ya radikale, dibe derfeteke baş di nav destên desthilatdaran de, bi taybetî ji bo pasîfîzêkirina şoreşgeran û ji bo zedêtir qedexekirina partî û sazîyên ku li dijî siyaseta dewletan têdikoşin. Wisa em dibînin ku xuyabûna li warên raya giştî, bi gotîneke din cihgirtina li refên sîstemê, ne qebûlbûyî e. Tenê bi guhertina hundirê xwe re têkoşînen şoreşger tene dîtin û wan didin dîtin. Bi gotîneke din: Bi qasî ku mirov destûrê dide ku xwezaya tevgerên li dijî sîstemê li gorî nihêrînen liberal were guhertin, ewqasî jî mirov qedexekirî qebûl dike. Ji

ber van sêdeman, pêwîst e ku aktîvistên Kurd, bi taybetî yê li Ewropayê, bizanin ku tevlîbûna di lêkolînan de bîyareke polîtîk e û ji bo rengê dewama dîroka jî bi roleke mezin radike. Ji bo gelên bindest û ji bo tevgerên li dijî sîstemê, û bi taybetî ji bo jinên çalakvan ên ji gelên blindest ên ku di nav tevgerên li dijî sîstemê de cih digirin, her meqale, her pirtûk, her belgefilma ku îro were weşandin, dîroknivîsandin bi xwe ye.

Di destpêka vê nivîsê de me behsa girîngbûna sala 2014'an weke werçerxekê kir. Lê bêguman, ji vê demê heta niha, gelek tişt guherî: Yek ji wan jî ew e ku îro ji wê demê zedêtir, tevgera jinên Kurd bi gelek êrişan re rûbirû ye. Heger rojname û televîzyonên biyanî wê demê ji bo hevdiyênê bi jineke Kurd re zehmetî kişandin, îro çima bîdengî heye? Mesele ne ew e ku mijara jinên Kurd kevin bû û ji ber vê yekê nema balkêş e. Hem avakirin, hem jêbirina rojevan herdem bi zanebûn çêdibe. Ev jî bandora xwe li ser xebatên akademîk dike. Heger bixwazin, lêkolêr dikarin êdî pîrsên xwe ji li gorî vê rewşa nû amade bikin: Operasyonên dewleta Tirk bi alîkariya çeteyan çawa bipêşketina jinên Rojhilata Navîn asteng dikin? Li dijî dagirkerî û şer, jinên Kurd, Erebi, Suryanî, Çerkez û Tirkmen bi hev re çawa li ber xwe didin? Rola dewletên Ewropî di van şeran de çi ye? Rola zaningehên me ji bo bipêşketina teknolojîyên şerî çi ye? Bi qedexekirina sazîyên tevgera azadiya Kurd, dewletên Ewropî di asta navneteweyî de çawa hevkarîya tevgerên jinan asteng dikin?

Di roja me ya îro de jenosîd, ekosîd û feminîsîd di asteke kurewî de bi hev ve girêdayî ne. Cidîgirtina tehlîl û tecrûbeyan wan kes û aliyên li ber xwe didin li dijî vê sîstema desthilatdar û jiyankuj, ne bi tenê ji bo lêkolînên akademîk balkêş e - ev herwiha perspektîfê dide têkoşînen sîberojê li hemberî kapitalîzma û faşîzmê. Di dema krîza ekolojîk de, danûstandina di nav tevgerên alternatîf de meseleyeke heyatî ye. Ji ber vê yekê ji lekolerên ku dixwazin rexneyan li sîstema desthilatdar bikin, lazim e beramberî xebatên xwe yê akademîk ji polîtîk bîrewer û haylêhebûyî bin.



Dilar DÎRIK

Bi bênavkirinê gotara Sovyetî beramberî Kurdan

Gotar ji bo avakirina têgihîştin û zêhniyetê têra xwe bi kêr tîn û mirov dikare di nava gelek metn, dimen, deng û siyasetan de van gotaran bibîne. Em ê berê xwe bidin gotareke taybet: metnên rojnameyê. Em ê berê xwe bidin rojnameyê sovjetî ya heftane û rojane, ya bi navên "Moscow News Daily" û "Moscow News Weekly". Helbet ne mumkin e mirov bi gotara rojnameyê hemûyî û tevahiya aliyên gotara wê bi nivîse kurt dakeve, jixwe niyeta min jî ew e ez binihêrim ka rojnameyê ji perspektîveke Sovyetî ya ku weşan ji bo biyanîyên li nava Sovyetê û derveyî wê dikir, Kurd dîtine yan na; Kurd dîtîbin çawa dîtibe? Awirêkî pêşî jî bi rehetî didit ku bêhna oryantalîzmeke giran a Sovyetî jê difûre. Pirraniya nûçeyan li ser Kurdên Ermenistan, hinek li ser ên Qefqas û weki din jî di nava hin nûçeyên berferehtir ên li ser çand û huner de cihêkî piçûk jî ji Kurdan re hatiye veqetandin. Kêman caran Kurdên Başûr - di dewrên diyar ên weke 1963, 1970'yî de - û yên Rojhilat - gerçî penabirina Sovyetê ya Mistefa Barzanî bi qederê 500 kesî re mirov li kijan beşê bihesibîne, meseleyeke din e - di nava rûpelên wê de cihê xwe digirin. Hevpeyvîneke "tenê" ji bo Moscow Newsê (MN) ya bi sekreterê giştî yê PKK'ê yê hingê Abdullah Ocalan re û çend nûçeyên li ser rewşa Kurdên li Laçîn û Azerbaycanê belkî di nava vî dimenê giştî de îstisna bin. Bi heman rengî wergera gotareke Riya Teze ya di rojnameyê de weşandî û gotareke weke bersiva xwendevanên rojnameyê yên Kurd hatiye weşandin jî, dikarin ji van îstisnayan bîn hesibandin. Lê dimenê giştî, yê gotara MN li ser Kurdan jî serî heta binî dibêje, "binihêre, Kurdên me çi qasî rehet in, çi qasî razî ne û mafê wan jî yên her devera din bêhtir e"; ev gotin xwe bi awayekî çor li nav dev û rûyê me dixin. Hin nivîs jî fonksiyonel in, armanca wan diyar e. Weke nimûne çend gotarên di serdema desthilatdariya Beesê li Iraqê de, argumana sereke dibêje, imperyalîst Kurdên Başûr jî bo menfeetên xwe bi kar tînin. Lê ew jî bi nasnekirina deverê û nezanîna detayan têra xwe oryantalîst in*. Mirov dikare bibêje, Sovyeta ku ji Kurdistanê bêhtir li rojhilat e, oryantalîzma rojava li rojhilat û başûrê dinyayê dike, li



Luqman GULDIVÊ

gelek miletên li nav xwe, lê nexasim jî li Kurdan dike.

Qencyên kolonyalîzmê?!

Li Fransayê 23'yê Sibata sala 2006'an parlamenê qanûnek erê kir û tê de ev hevok hebû: Bernameyên dibistanê nexasim jî rola erênî ya hebûna Fransî ji der-yayê û wêde û bi taybetî jî li Bakurê Afrîkayê nas dike.** Bifikirin, nexasim jî li metropolên Fransayê bi milyon mirovên ji Bakurê Afrîkayê hene; bavkalên wan kolonîzekirî bûn. Tesîrên kolonyalîzmê yên yekser li bavkalên wan bûne û hîna jî tesîrên yekser û ne-yekser ên heman siyasetê li wan dibin. Ew li dibistanan rojekê dibihîsin ku behsa kirinên qenc û erênî yên mêhtingeriyê û kolonîzekirinê hene. Ev bi serê xwe destwerdaneke pîrr yekser a li dinya têgihîştinê ya şagirt û zarokan e. Zarokên ku dêûbavên wan hîna nû nû "dekolonîze" dibin, bi îndoktrînasoyoneke dijwar û her wiha hizreke ecêb oryantalîst re rû bi rû ne. Lewma kirinên qenc ên kolonîzatoran çêkirina rê, dibistan û dewleteke xurt e û jî kolonîzekiriyên re dibêje, "hûn kêman in, "em jî we çêtirkin in", "Em we medenî dikin".

Medenîkirina Kurdan

Ha ev "em we medenî dikin" di gotara Moscow News a beramberî Kurdan de ecêb be loq e. Di hej-mara 170'yî ya Moscow News Daily (ji niha û pê ve MND) de anektodek heye di rûpelê sporê de***. Di nava nivîsa Boris Olenin de ye ev anektod. Li gorî wê, Dr. Edward Brooks beriya çendekê (li gorî hingê) çûye Sovyetê û gava di Ermanistanê re bihuriye jî rêberê wî muhendîsek bûye. Wî jî vî muhendîsî her xwestiye Kurdan nîşanî wî bide, lewma bi hizra wî Kurd "koçer" bûne û "mal û erdên wan nîne" û "talanê xelkê" timî rakirine. Muhendîsê min û te jî axir jê re dibêje, "li dîr negere, ez Kurd im". Axir Dr. Edward Brooks hê bêhtir matmayî dimîne gava hîn dibe ku muhendîsê Kurd, şampiyonekî boksê û yek ji futbolvanên herî serketî yê Ermenistanê ye. Lê MND û nivîskarê gotarê Boris Olenin pêwîst nabinin navê wî muhendîsî jî hildin. Pîrr bi be loqî dibêje, binihêre me ew koçer û talanker medenî kirin. Mirov rexneyeke li oryantalîzma rojavayî-yan a bi oryantalîzmeke çor a Sovyetî di vê meqaleya

Esas em hîn nabin ka ew "pêngavên mezin çi ne". Heta em hîn nabin, ka ew behsa Kurdên li Tiflîsê tenê dikin yan li gund û bajarên Gurcistan, Ermenistan û Azerbeycanê dikin. Bênavkirineke ku muhtemel e xwe bisipêre pêşukmen belav ên li nav Sovyetê yên di anektoda li jor de behsa wan hat kirin: Kurd koçer in, bê erd û milk in, talanê radikin...

sporê de dibîne.

Lê ev meseleya medenîkirinê bi nûçeyên li ser alfabe, dibistan û kitêbên Kurdan û bi Kurdî bêhtir xwe dide der. Nûçeyê jî Êrîvanê bi sernûçeya "Alfabeya nû ji bo Kurdan hat bipêşxistin" hatiye weşandin. Hema di bin sernûçeyê de armanca medenîkirinê li xwe eşkere dike: Versiyona latînî jî bo têkoşîna nexwendebûnê. Nûçe bi îmzeyê "Z. Ajemian" derketiye. Agahiyên sere-sere yên li ser Kurdan û bi xweşîkî gotina "Kurd ji derve hatine" nûçe dibêje, "Heta Ermenistana Sovyetê nehat damezirandin, asta bipêşketina çandê ya Kurdan kêman bû. Piştî hingê alfabekeke bi herfên alfabe Ermenî hat amadekirin, lê ji ber bilêvkirina cihê ya di zimanê Kurdî de gelek kêmasî tê de hebûn.

Piştî gelek hewldanan, komeke zanyar û pisporên filolojî û zimanê Kurdî alfabekeke nû ya latînzekirî çêkirin. Hêvî ew e ku ev yek wê bike ku li nav eşîrên Kurdan xwendebûn berbelav bibe.

Halê hazir li her gundî dibistanek heye. Li Êrîvanê dibistaneke bilind (teknîkum) heye jî bo ku mamoste-yan jî bo dersdana li dibistanan amade bike. Ji bilî dibistanan, rojnameyê heye û gelek kitêbên cihê hene ku bi alfabe nû hatine çapkirin.***



"Gelek neteweyên Qefqas şên dikin, qaîdeyên hîlbijartinên ji bo Sovyeta Bilind bi komî bi zimanên xwe xwendin. Ev keçên Kurd ên li Tiflîsê, paytexta Gurcistana Sovyetê jî endamên komeke xwendina li ser hîlbijartinan in." Bi vê metnê tenê Kanûna 1937'an di rûpelê 12'an de MNW'ê ev wêne weşandiye. Yek jî pîrr kêman wêneyan e ku Kurd tê de xuya dikin. Jixwe, weke wêneyên din ku ew ê di salên 1970'yî de bi kar bîne (tenê çendek in) li bajêr, heta li paytextê hatiye girtin.



Semendê Siyabend

'Kurd koçer in, bê erd û milk in, talanê radikin...'

Bênavkirina Kurdan, lê bi wan pesindayîna Sovyetê her di nava gotinan de weşartiyê. Di hejmar 42 ya sala 1934'an a Moscow News Weekly (ji niha û pê ve MNW) de meqaleyê li ser rewşa zanistê li Sovyetê heye. Di dawîya meqalayê de behsa kesên bi navê Field û Martin dike, her du jî di çarçoveya seferê lêkolînê ya antropolojîyê de ji Emerîkayê çûne Sovyetê jî. Beriya biçin Sovyetê ew çûne "Erebistan", "Mezopotamya" û "Persiya"yê. Ew endamên komeke lêkolînê antropolojîk a Emerîkayê ne û karê komê jî aliyê Muzeya Dîroka Neteweyî ya li Chicagoyê ve hatiye organîzekirin. Ew li Tiflîsê "Kurdên Sovyetê" dibînin. Rojname wiha behsa xwe dewam dike: "Dema ew li Qefqasan man, berê awirên wan li ser karê çandî yê Kurdên li Yekîtiya Sovyetê bû. Field got, 'Tiştêkî halo li welatên din ên ku Kurd li wan dimînin, nîne. Çanda karkerên Kurd li Transqefqasyayê pêngavên mezin avêtine.'*****

Esas em hîn nabin ka ew "pêngavên mezin çî ne". Heta em hîn nabin, ka ew behsa Kurdên li Tiflîsê tenê dikin yan li gund û bajarên Gurcistan, Ermenistan û Azerbeycanê dikin. Bênavkirineke ku muhtemel e xwe bispêre pêşhukmen belav ên li nav Sovyetê yên di anektoda li jor de behsa wan hat kirin: Kurd koçer in, bê erd û milk in, talanê radikin...

Heman salê MND'ya 26'ê Tebaxê, gava behsa hebûna nivîskarên Kurd û Tirk li Ermenistanê dike, wiha behsa Kurdan dike: "Beriya Şoreşê zimanekî ni-

► Dîmenê giştî, yê gotara Moscow News li ser Kurdan ji serî heta binî dibêje, "binihêre, Kurdên me çî qasî rehet in, çiqasî razî ne û mafê wan ji yên her devera din bêhtir e"; ev gotin xwe bi awayekî çor li nav dev û rûyê me dixin.

vîsê yê Kurdan nebû, lê belê niha wêjeya wan bi pêş dikeve li ser bingehê folklorê dewlemend a Kurdî." Axir, ev şewazê behskirina Kurdan, a ku wan bi "Şoreş" a Sovyetê manedar û bi nav dike, xwe gelek caran dubare jî dike. MND'ya 6'ê Tirmeha 1935'an behsa koma şanoyê ya Kurdan dike, ya ku bi xêra şoreşê ava bûye û wê li gundan bigere. MND'ya 17'ê Tebaxa 1937'an behsa wê yekê dike çawa bi avakirina dibistanan û alfabe ya Kurdî, xwendekirin di nava Kurdên Sovyetê de serketî bûye. Di nûçeyê de behsa weşana kitêba Folklorê Kurmanca a Emînê Evdal û Heciyê Cindî jî tê kirin, bêyî binavkirina kitêbê û nivîskar û behevkarê wê. Nûçeya weşana kitêbê jixwe beriya wê bêhtirî mehekê di MND'ya 4'ê Tirmeha 1937'an de derdikeve, dîsa bêyî ku navê kitêbê û nivîskarê wê bê hildan. Êdî her serê çend salan carekê meqaleyêke têra xwe berferêh wê li ser Kurdên Ermenistanê bihata weşandin û di navê de hevokên weke "Çawa dibû ku ewqas Kurdan xwendina xwe ya bilind li Leningradê kirin" (Di MNW ya 17'ê Çileyê 1948'an rûpel 4 de). Di rûpelê beriya wê de jî (rûpel 3) bi awayekî ku ta bi derziyê ve bê kirin, hatiye nivîsîn ku "Mafên Kurdan hemû li Ermenistana Sovyetê hene", lê li deverên din ên dinyayê mafê Kurdan nînin.

Di binavkirinê de bînavkirin û qehremanê Kurd ê Sovyetê

Mirov di binavkirinê de jî bînavkirinekê dibîne. Di MNW ya hejmar 8 a sala 1946'an de portreyekî Samand Siabandov (Semendê Siyabend) heye. Ew weke namzetê Meclîsa Bilind a Sovyetê ya Yekîtiya Komarên Sosyalîst a Sovyetê (USSR) tê danasîn, lê em hema di bin sernivîsê de wê dixwînin: Jiyana [vî] namzetî nişana bipêşketina neteweya piçûk a li Ermenistanê ye*****.

Em hin tiştan kite bi kite li ser Semendê Siyabend hîn dibin, lê em bi bînavkirineke ecêb re rûbî rû ne. G. Kolmanov ev portreyê Semendê Siyabend nivîsandiye. Di tevahiya nivîsê de giştikirinên li ser Kurdan gelek in, lê ber bi dawiyê ve dibêje, derfeta wî çêbûye biçê gundên Kurdan û kolxozên wan ên di xwedîkirina sewalan de serketî bibîne. Li şûna wê li Êrîvanê ew çûye "şanoya Kurdan" a sala 1936'an bi alîkariya Ermenîyan hatiye vekirin. Li wir, "ez bi gelek endamên din ên întelejensiyaya Kurd a nû re dam nasîn. Wan amadeyî li bajarên xwe xwendibû û niha li zanîngeh û înstîtuyên cihê yên Êrîvanê dixwendin. Min keçe ciwan a Kurd nas kir, wê mastira xwe kiribû di zanîstên filolojîk de. Wê jî min re behsa Kurdekî kir ku li Zanîngeha Dewletê ya Ermenistanê ders dida. Wê behsa Kurdekî din jî kir ku di Meclîsa Bilind a Sovyetê ya USSR'ê de nûner bûye, ew berpirs bûye ji organîzasyona mezin a firotina tevahiya pembûyê li Ermenistanê tê hilberandin.

Heger Semendê Siyabend bê hilbijartin, ew ê bibe Kurdê duyem ê ku weke nûner bikeve Meclîsa Bilind a Sovyetê ya USSR'ê."

Ew Kurdên bînav ên Sovyetê û "Samand Siabandov" ê ku "qehremanê Sovyetê" ye, tenê weke serketina Sovyetê hene. Navê Semendê Siyabend jî tenê heye ji ber ku "Jiyana [vî] namzetî nişana bipêşketina neteweya piçûk a li Ermenistanê ye".

Destpêka wê gotara "medenîkirinê" mirov di nûçeya alfabe yê de bibîne, jî, nûçeya bi îmzeya "Z. Ajemian" a bi sernivîsa "Bipêşketina eşîrên Kurdan" halê herî xav ê wê gotarê yê destpêkê ye. Meqale bi boneya weşandina hejmar 100'î ya "Ria Taza" hatiye nivîsandin û li berhevgirtina Kurdên "Beriya Şoreşê" û "Piştî Şoreşê" vî aliyê gotarê pirr zêde beloq dike.*****

Axir ew îstîsnayên li jorê min behsa wan kir û meqale û nûçeyên mayî yên di MND û MNW'yê de ji



bo kitêbekê li ber min in û ez ê bêhtir kite bi kite bi naveroka metnan û analîza wan hingê dakevim.

Li şûna encamê

Mirov nexasim di destpêka gotara Sovyetê ya bi zimanê Ingilîzî de esas rastî tiştêkî sereke tê. Ew jî rewakirina Sovyetê jî bo biyaniyan bi rêya gotareke "medenîkirinê" ye, ya ku dibêje, binihêre, min Kurd çawa kirin insan! Ev gotara ku "kirinên baş" ên kolonîzekirinê bivênevê bi bir dixwe, xwedî xisleteke sereke ye: Bênavkirina ewên tînen medenîkirin. Hostetiyêke mezin e ku mirov portreyekî binivîse û tê de qismî xwediyê portre, gelek kesên din weke "keçeke Kurd a ciwan", "Kurdek" û "Kurdekî din" bînav bike. Lê ev hostetî mîrasa oryentalîzmê ya giştî ye ku Sovyet di meseleya rewakirina xwe di çavê şaristaniya rojava de ne tenê hazir e bi kar bîne, lê di nimûneya Kurdan de wê yekê xweşik jî dike.

* Binihêre li Said, Edward W. (Orientalism, vintage books, New York, 2003 (Çapa 1'ê 1978).) û Guldivê, Luqman (ORIENTALISMUS bei SAID und ÖCALAN, und unser Alltag: Für eine alternative demokratische Moderne, di Kurdistan Report, hejmar 155 Gulan/Hezîran 2011 r. 43-46).

** Salekê paşê ev hevok ji qanûnê (Loi n° 2005-158) hat derxistin, lê di xala 4'an a qanûnê de li çûna wê wiha hat nivîsandin: Bernameyên lêkolînê yên zanîngehan cihê ku heq dike didin hebûna Fransî ya ji deryayê û wêde nexasim ya li Bakurê Efrîkayê.

*** 24'ê Tirmeha 1934'an di rûpel 3 de hatiye weşandin.

**** Di MND'ya 9'ê Tebaxa 1932'yan de di rûpelê 25'an de hatiye weşandin.

***** Hejmar 42'yan a MNW'yê ya 11 Cotmeha 1934'an, di rûpelê 10'an de derçûye. MND ya 3'yê Cotmeha 1934'an jî behsa heman mijarê dike di rûpelê 4'ê de û hema hema heman gotinan bi kar tîne.

***** Hejmar 9'an a MNW'yê ya 26'ê Çileyê 1946'an, di rûpelê 3'yan de derçûye.

***** Di MND'ya 4'ê Nisana 1933'yan di rûpelê 4'an de hatiye weşandin.

Malê Mîratê: **Vîs û Ramîn**

erd Agron*

Wêke welat, civak û dîrok, paşxaneyê me ya çand û vebêjîyê jî hatiye texrîb û talankirin. Ji serdema Pers, Sasanî, Sefewî û Selçûqîyan ve talan û texrîb û politikayên bînasnamekirinê didomin. Ev bi kesayetên weke Firdewsî tê kirin. Çawa Firdewsî çirokên Rustemê Zal di bin navê "Şahname"yê de tomar kirine ji bo bexşîşeke mezin û pêşkêşî Selçûqîyan kiriye û bi vî awayî çirok kiriye malê Farisan, peyrewên wî jî li dû şopa wî çûne. Li gel ku ji gerdîşa vebêjîya Kurd tomar kiriye ji bi tenê bi heqaret qala Kurdan kiriye. Fexredîn Curcanî şopdarekî wî ye ku "Vîs û Ramîn" weke mesnewî jî nû ve nivîsandîye, li Farisan kiriye mal û wî jî weke hostayê xwe careke bi tenê ew jî bi heqaret behsa Kurdan kiriye.

Xwîner wê niha bibêje, "Baş e, çîroka Rustemê Zal ya Kurdan e. Lê Vîs û Ramîn?" Em jî hewl didin bersiva vê pîrsê bibînin. Lê beriya vê pêdivî heye mirov îşaret bi çend xisûsan bike.

Ji serdema ku Îslama desthilatdar bi hemû mezhebên xwe li Rohhilata Navîn serwer bû û pergala xwe ya perwerdeyê da rûniştandin heta niha malê Kurd bûye malê mîratê û tê talankirin. Kurdên ku xwedî çandeke kevnar, wêje û huner bûn, bi gîştî dest ji dinyaya cismanî kişandin û bere xwe bi dilsozî dan hêla manewî ku ol îşaret pê dikir. Ji ber vê, dest ji mîmariya xwe ya qesr û qonaxa berdand, dest ji amûrên xwe yê muzîkê ên kevnar kişandin, wêjeya xwe ya devkî, bi form û referansên olî xemilandin. Mesele ewqasî cidî girtin ku Mîrza Mihemeyê ku serpêhatiyên wî xwe dispart serdema lehengiyê, êdî weke sehabe û komprodorekî împeryalizma Îslama desthilatdar tevdişîyê û herçî ku eşhed nedîyanî serê wan hildiqetand û diavêt. Halbûkî referans û motivasyona Mîrza Miheme ne Îslam bû. Wî jî weke gelê xwe piştî Îslam pejirandibû û bi ihtimaleke mezin piştî ku Misilman bûbû serpêhatiyên wî jî bi dawî bûbûn. Bivênevê, mirov meraq dike ka berî Îslamê çîroka Mîrza Miheme ya Memê Ala, ya Rustemê Zal û yê din çawa dihatin gotin. Tenê, heke mucîzeyek çêbe em dikarin bersiva vê meraqa xwe bibînin.

Destpêk tesbîtkirina mîrî û xwemîriyan e "Vîs û Ramîn" jî çîrokek ji van çîrokên kevnar e.

Hema em rasterê bibêjin, ev jî malê mîratê ye û çî bi serê çîrokên din hatibe, bi serê vê çîrokê de jî hatiye. Lê niha ev weke çîroka Farisan ya evîne tê zanîn.

Erê gelek çîrokên Kurd û Farisan hevpar in. Ji ber ku dîrok, ziman û çanda wan pîrr di nava hev re derbas bûye. Xwezî Farisan jî hay ji vê rastiyê hebûya. Lê mixabin Kurd bi tenê hay ji vê hevpariyê hene. Helbet hevparî tiştêkî pîroz e.

Erê gelek çîrokên Kurd û Farisan hevpar in. Ji ber ku dîrok, ziman û çanda wan pîrr di nava hev re derbas bûye. Xwezî Farisan jî hay ji vê rastiyê hebûya. Lê mixabin Kurd bi tenê hay ji vê hevpariyê hene. Helbet hevparî tiştêkî pîroz e. Dema ku em behsa ronansana Rohhilata Navîn dikin jî divê em teqez hay jê hebin ku tenê ev ronans bi hevpariya çand û civakên Rohhilata Navîn dikare pêk were. Divê ku angaştên di vî warî de hemû vê rastiyê derpêş bikin. Ne wisa be, ji bo Rohhilata Navîn wê tiştêkî nû nêye gotin.

Em niha di destpêka ronansanekê û hewildana jî nû ve îşakirina neteweya demokratîk û civaka xwezayî de ne. Lê mixabin divê ku em ewilî karibin xwe nas bikin. Divê ewilî em zanibin ka çî yê me heye û em ê karibin hevpariyê çawa ava bikin. Ji bo vê, gere em karibin ji bin kavilk û xirbeyên dîrokî berhemên xwe kom bikin. Li gora angaştê netewewewle-tan tiştêkî Kurdan tine ye. Heta doh pêr, Kurd bi xwe jî tinebûn. Hevkarî û hevparî bi yê neyî re ne pêkan e. Hevparî û hevkarî bi yê heyî û tiştêkî wan heyî re tê kirin. Wê çaxê hem jî bo pêşengiya ronansana Rohhilata Navîn, hem jî ji bo pêşengiya jî nû ve îşaya civaka dîrokî jî divê em dest bi daweyê dîrokî bikin. Ne bi tenê dawa ziman, niştîman û statûya politik divê ku hemû berhemên me yê hatine dizîn jî werin îade kirin. Helbet ev karekî hêsan nîne. Lê îsar dermanê hemû derdan e. Dema ku me Newroza xwe xwest, bi me kenîyan, tinazê xwe kirin. Piştî li me qedexê kirin. Niha dibêjin Newroz ya me ye jî. Îsarê hevparî jî bi xwe re anî. Heta ku em bêpar bin, em ê ne hevpar bin. Bi îsar û pêwîstiyên me, em ê karibin xwedî par bin.

Hemîna ku em ê yê xwe bixwazin, divê ku em di hemû berhem û bermahiyên çandî, hunerî û dîrokî yê Rohhilata Navîn de li şopa pêşiyên xwe bigerin. Bi vî awayî gere em li poema "Vîs û Ramîn" jî binîhêrin. Ehmedê Xanî navê wan weke Weys û Ramîn di Mem û Zîna xwe de hildaye. Ji ber ku "waw" a elfbêya Erebi di Farisî de "vav" e, mirov dikare forma Ehmedê Xanî, weke forma Kurdî qebûl bike. Ger ku lêkolînên baş li ser werin kirin, rastiyên wê wê werin ronîkirin. Dema ku mirov vê berhemê dixwîne, bivênevê mirov hin pirsan dike. "Vîs û Ramîn çîroka kê ye?", "Gelo ji çanda hevpar hatiye hûnandin yan ev jî çîrokek ji çîrokên malê mîratê ye?", "Têkiliya vê bi Kurdan re çî ye?", "Ev çîrokeke evîne ye yan ya tolhildanê ye?", "Gelo şopa vê çîrokê li ser çîroka Delîlaya Cihû heye yan na?"

Ne çîroka evîne lê ya tolhildanê ye

Herçî ku li agahiyên derheqê "Vîs û Ramîn" de bigere, ew ê ewilî leqayî hin agahiyên ansiklopedîk were ku dibêjin; çîroka klasîk a wêjeya gel a Îranê ye. Li gora agahiyên çîrokeke pîrr kevn e. Bi devkî hatiye veguhastin. Cara ewilî bi zimanê Eşkanî (Xanedaniyê Persan) hatiye nivîsandin. Piştî li Pehlewî hatiye wergerandin û nivîsandin. Di sedsala yanzdehan de bi daxwaza waliyê Selçûqîyan e Îsfahanê jî aliyê Fexredîn Curcanî ve weke mesnewî jî nû ve hatiye nivîsandin. Prof. Dr. Mehmet Kanar ê ku ev mesnewî jî wergerandiye Tirkî, qinyata xwe û dibetiya ku ev çîrok a Medan be, tine ziman. Dema ku mirov bi hin daneyên ku di vegotinê de bala mirov dikişînin, rêya xwe bikudîne, mirov bexuşûşî dikare bibêje, camêr rast dibêje. Lê dîsa jî lêkolîn pêwîst in ji bo encamên teqez. Li gora ku dixuyê, wexta ku F. Curcanî jî nû ve nivîsandîye hêl û hêmanên wê yê ola Zerdestî jê ne-



qandine û xwestiyê rengêkî tesewîfî bidîyê. Gerçî mirovekî pîrr zana û hakimê ilmê tesewîfî bûna, jixwe jî Selçûkiyan re nedîvîsand lê jixwe, ew ê çîrûskên agirgehên ola Zerdestî çawa di nava felsefê û feraseta tesewîfî de diçîrise dîtîbûna. Lê camêrî nekarîye li gel hemû hêz û daxwaza xwe jî hêlên Zerdestî jê bineqîne. Ev agir hîn jî di her xwendinê de şuhle dide.

"Vîs û Ramîn" ne çîrokeke evîne ye. Ew çîrokeke tolhildanê ye. Û çîroka Delîlaya Cihû jî îlhama xwe ji vê çîrokê girtiye. Kuliyata olî ya Cihûyan di şert û mercên çawa de û bi çî awayî hatiye nivîsandin, tê zanîn. Ji ber vê jî, angaşt xelet nîne.

Çîroka Vîs û Ramîn bi kinahî wiha ye: Şahbanû Şehrû keybanûya Mehabadê ye. Rojekê Şahînaş Mubed çav bi Şehrûyê dikeve û ne bi dilekî bi heft dilan dil dikeve Şehrûyê. Şahînaş Mubed dawa zewacê lê dike. Lê ew, daxwazê red dike û her dû bi hev re qewl datînin ku qîzeke Şehrûyê çêbe, ew ê bide Şahînaş Mubed. Dem di ser re derbes dibe û keçek ji Şahbanû Şehrûyê re çêdibe, navê wê datîne "Vîs". Sal di ser re derbas dibin. Vîs dibe jineke pîrr xweşik û tê çaxê zewacê. Şahbanû Şehrû di welatê xwe de xortekî layiqê wê nabîne, qewlê bi Şahînaş Mubed ra daniye jî ji bir dîke û dixwaze Vîsê bi birayê wê Vîrû re bizewicîne. Ev bi ber guhê Mubed Şah dikeve. Ewîlî dixwaze meselê aştiyane çareser bike û birayê xwe Zerd weke qasîd dişîne. Lê Vîs qewl û vê daxwazê red dike. Li ser vê, Şahînaş Mubed bi ser welatê Kurdan Mehabadê ve digire û dor lê digire. Mehabadî li ber xwe didin. Di şer de Karenê (ku em cara ewilî navê wî dibihîzin) mîrê Şahbanû Şehrûyê bi gelek berxwedêran re tê kuştin. Karen bavê Vîs û Vîrû ye jî. Piştî vê kersetê bi rojekê ku fermanîdarê artêşa Vîrû ne li kelehe ye, Şahbanû Şehrû (êdî bi kîjan tîrs û fikarê be) bi Şahînaş Mubed re li hev dike û Vîsê dide wî. Mubed dorpêçê radike û Vîs bê dilê xwe be jî li gora hevpeymanê tevdişîyê û bi wan re diçe. Lê di seraya Şahînaş Mubed de xwe tecrîd dike. Daxwazên wî yê zewacê napejirîne.

Di pey re Dadika wê ya ku ew mezin kiriye li pey wê diçe di seraya Şahînşah Mubed re derdikeve, dişa xwe digihîne Vîsê. Li gor dixuyê Dadik vala neçûye û di wê derê re derneketiye. Hema demildest ew jî dikeve pey hewildana dilê Şahînşah Mubed jê sar kirinê. Ji bo vê sêhran dike, nivîştan çêdike.

Dilê Vîsê li Şahînşah rûnanê. Ma dilê kîjan jinê li qatîlê bavê wê rûdinê? Ma ka dilê kîjan jinê li qatîlê qewmê wê rûdinê ku yê Vîsê rûnê? Ka dilê kîjan jinê li yekî ku ew ji destê dergistiyekî ku li ber dilê wê şêrin be revandiyê, rûdinê? Jixwe, ew keser û kula dilê xwe jî gelek caran ji Dadika xwe re dibêje:

*"Ger ku bextewariya min bi mêrekî be
Bi miradê xwe şanebûn ji min re çêtir e."*

Evînek ji bo darbeyekê?

Ev îşaret bi xemgînî û kîna dilê wê dike. Vîs çiqas neçar be jî Dadika wê ne wisa ye. Xwedî bername û amadekarî ye. Jê re qala Ramîn dike û dixwaze dilê xwe lê veke. Lê Vîs ewqas tijî ye ku Dadikê bi bêsermîyê sûcdar dike û li erzê wê dikeve. (Li gora ku dixuyê, ji bo navbeynkariyê Dadik bir fanteziyên F. Curcanî yên ku dilê mirov dixelînin re rû bi rû ye. Feraseta zayendperest ku jinê weke xwezoka têtîliya zayendî dibîne, di Curcanî de jî serwer e. Li gora wî dema ku Ramîn ji Dadikê dixwaze navbera wî û Vîsê çêke, Dadik vê napejirîne. Lê piştî ku Ramîn pê re radizê, ew dibe minettarê wî û pê qayîl dibe navbera wan çêke.)

Wexta ku Dadik ji Vîsê dixwaze ku ji Ramîn hez bike, dibêje:

*"Bizane ku tu hezkirina xwe li Ramîn bibexşîni
Ew ê bibe Xusrevê me tu ê bibî Şîrîn."*

Vîs hay jê heye ku Ramîn birayê Mubed e. Dema ku bi ser welatê wê de girtibûn, Ramîn jî femandarek bû. Destê wî jî di xwîna bav û berxwedêrên welatê wê de heye. Ji bo vê her tim teklîfên Dadikê red dike. Piştî jî qaneh dibe. Helbet çimaya vê girîng e û bêbersiv jî namîne.

Ji xeynî beşa 26'an di ti dera mesnewiyê de qala elaqeya Ramîn ya ji bo Vîsê nayê kirin. Di vê beşê de qala elaqeyêke platonîk tê kirin. Ji ber vê jî dema ku Şahînşah Mubed dixwaze êrişê bibe ser wan, Ramîn tund li hember derdikeve. Lê dişa jî tevî cerdê dibe. Ev nakokî ye ku li gora dixuyê piştî li şer hatiye zêdekirin. Ji ber ku ti îşaret tine ye li wê yekê ku Vîs û Ramîn berê hev dîtibin.

Di beşa 32'yan de dişa qala evîndariya Ramîn tê kirin. Di vegotinê de qet qala evîneke platonîk nayê kirin û carê. Evîndariya wî li ser dîtina ewilî ya hingê tê ravekirin. Piştî jî em rastî evîneke beriya ve nayên. Ev jî bo çi girîng e? Ev jî bo vê girîng e ku em bibêjin "Vîs û Ramîn" ne çîroka evînê, çîroka tolhildanekê ye.

Li gora ku dixuyê Dadika Vîsê ew qaneh kiriye û bernameya tolhildanê ketiye meriyetê. Ji vir û wê de amadekariya darbeyê dikin, Vîs dile xwe ji Ramîn re vedike û edî Ramîn ji bo Şahînşahiye tê amadekirin. Çîrok edî heta roja darbeyê bi vegotin û çûnûhatinê evîniyê didome.

Rojeke ku Şahînşah Mubed bi giregirên serayê re diçe nêçîrê, Vîs ji Ramîn re xeberê dişîne û dixwaze vegere serayê û li ser textê Şahînşahiye rûnê. Ramîn bi dizî jî nêçîrê jî gel Şahînşah Mubed vedigere, bi xef dikeve serayê û birayê xwe Zerd dikuje û serayê dixê destê xwe. Dema ku bi vê rewşê dihese Şahînşah Mubed amadekariya şerekî mezin dike lê di amadekariya şer de bi êrişê berazekî dimire. Ramîn dibe Şahînşah. Virû yê birayê Vîsê dibe serfermandarê artêşê, Şîrû jî (ku em nû pê dihisin ku ew jî birayê Vîsê ye) dibe berpirsyarê serayê.



Mehabad welatê Kurdan û jinan

F. Curcanî yê ku weke mamosteyê xwe Firdewsî dijminê Kurdan e, ji bo şelaqiya bi xwediyên xwe (Selçûqî) re tenê bi rêzîkekê navê Kurdan hildide û ji bo wesifdayîna serdema Şahînşah Ramîn wiha dibêje:

*"Dinya ji diz û nijdevanan filitî
Ji Kurdan, ji Loran, ji rêbiran."*

Çîrok piştî mirina Vîsê û kalbûna Ramîn bi desthilatdariya kurê wan Xurşîd, diqede.

Xala balkêş jî ew e ku piştî deshilatdarî dewrî kurê xwe dike, Ramîn dibe cînarê agirgeheke Zerdeştî, sê salan geh li agirgehê tobe û duayan dike geh diçe li ser tirba Vîsê digrî. Gelo tobeyê jî kîjan gunehên xwe dike? Ne tobeya darbe û qetla birayên xwe be?

Derheqê çîrokê de çiqas lêkolîn hatine kirin, derbarê reseniya wê û guherandina wê de encamên çawa hatine bi dest xistin, ez nizanim. Derfetên zindanê jî ji bo şopandin û peydakirina xebatên wisa ne guncaw in. Encax bi têgihîştin, rabihîstin û bi nirxandîneke subjekt a hin daneyan mirov dikare xwe bigihîne hin encaman. Li gora vê jî dişa mirov dikare bibêje ev çîroka tolhildanê ye, ne ya evînê. Qet nebe jî mesnewiya F. Curcanî nivîsiye encama çîroka evîndariyê dernayê. Çîroka Delîluya Cihû çiqasî a evînê be ew jî ewqasî ya evînê ye.

Dema ku em di rastiya tolhildanê de serwext bibin îca girîngiya nasnameya Vîsê tesbîtîkirinê derdikeve pêşberî me. Vîs qîza Şahbanû Şehrû ye. Şehrû Keybanûya Mehabadê ye. Heger Vîs prensesa Mehabadê be nasnameya wê bi dîroka Mehabadê dikare zelal bibe.

Hem di dîroka kevnar him jî di dîroka nêz ya Kurd de Mehabad xwedî ciyekî girîng e. Li gel paytextiya Mukriyên Kurd ji Komara Kurdistan a Mehabadê re jî kiriye navend. Di dîrokê de jî em rastî guherandîneke demografîk a mezin nayên. Desthilatdarî guherîbin jî gelheya bajêr weke xwe maye. Wê çaxê em dikarin bi hêsanî bibêjin Vîs prensesê Kurd e. Û heyfa bavê xwe, gelê xwe û berxwedêrên welatê xwe jî Şahînşah Mubed bi vî awayî hiltîne. Jixwe evînê jî li xwe heram dike, bextewariya bi mêrekî jî layiqê xwe nabîne. Û terciha bi miradê xwe şanebûnê bi fazîlettir dibîne.

Di nasnameya Şahbanû Şehrûyê de jî em çespondina ve angaştê dibînin. Şehrû bi kesayeta xwe jî keybanûyekê zêdetir dişibe xwedawendekê. Em di kesayeta wê ya serwer û domînant de tê derdixin ku wê demê civaka Mehabadê ne civakeke bavîksalar e. Şehrû xwedawendekê û di politikaya welatê heyvê de (Mehabad) gotina dawî ya wê ye. Jixwe navê Karenê hevserê wê nayê bihîs-

Ji ber ku têtîliya jin, xwedawend û Hûriyen proto Kurd tê zanîn em xwe di ser mijarê re biqevêzin. Weke gotîneke dawî em bibêjin, Mehabad bajarê Kurdan e, Vîs prensesê Kurd e. Çîrok jî ne çîroka evînê, çîroka tolhildanê ye.

tin heta ku tê kuştin. Lê em di minakên qewldanîna li gel Mubed de, di qewl nasnekirinê de, biryara li hevkinê de jî ve dibînin. Yanî biryara şer jî ya aşitîyê jî ew dide. Dibe ku wê Dadik di pey re şandibe ba Vîsê û dibe ku bernameya darbeyê jî wê amade kiribe. Şahbanû Şehrû jî neke ku wisa zû têtîliyê bipejirîne nîne. Xuya ye çanda xwedawendiyê didomîne û dibe ku çîrok jî serdema xwedawendan jî mabe.

Di gelek deran de behsa Horiyan tê kirin û Şehrû weka heyv û tava horiyan tê şayesandin. Her çiqas F. Curcanî weke horiyên bihiştê şayesandibe jî dibe ku rasterast Hûriyên proto Kurd bin yên ku qal tê kirin.

Di hêla sosyolojîk de têtîlî û tarzê jiyana civaka xwezayî jî xwe dide der.

Di navbera navê Mehabad û jinê de jî mirov dikare têtîliyeke sembolîk deyne. Mehabad bi wateya xwe welatê heyvê ye. Heyv sembola jinê ye, yanî Mehabad welatê jinê ye.

Ji ber ku têtîliya jin, xwedawend û Hûriyen proto Kurd tê zanîn em xwe di ser mijarê re biqevêzin. Weke gotîneke dawî em bibêjin, Mehabad bajarê Kurdan e, Vîs prensesê Kurd e. Çîrok jî ne çîroka evînê, çîroka tolhildanê ye. Lê erê Şahînşah Mubed û Ramînê birayê xwe Faris in.

Di encamê de, çi dibe bila bibe divê ku em di çand û wêjeyê de jî ya xwe bixwazin. Ji bo vê jî divê ku çî tekstên kevnar hebin, em bi guman nêzî paradoksên wan bibin û dişa di ber çavan re derbas bikin. Ev jî bo îşakirina civaka xwezayî jî, ji bo ronesansa Rojhilata Navîn jî pêwîst e. Encax herkes bi para xwe dibe hevpar. Di jiyaneke hevpar de jî encax mirov zindî be dikare bibe xwedî par. Heta ku mirov reh bernede nava çemê dîrokê jî ne mumkin e ku mirov zindî bibe.

**erd Agron ji 2001'ê ve girtî ye di zindana dewleta Tirk de. Niha li Girtîgeha Şakranê girtî ye.*

Sohbetek bi nivîskar Sadiq Ūskan re

Rewşenbîr wardoz e, ne nivîskar e

Sadiq Ūskan berhevkarê folklorê Kurdî ye her wiha nivîskar e jî. Nexasim bi romana xwe ya Şampaz ku 2019 ji weşanên Wardoz derket, tê nasîn. Herçî xwendevanên dêhna wan li ser romana Kurmancî bû, ji vê romanê jî hez kir. Roman di warê ziman de jî xurt bû ku mirov tehma Kurmancî jê hildida. Me civateke xweş pê re gerand.

Sadiq merheba. Ez te ji mêj ve nas dikim, lê ji ber ku tu nivîskarekî hinekî veşartî yî (yanê em te di panel û bernameyan da nabînin û tu zêde bi ber çavê mirov nakevî) ji kerema xwe, tu dikarî ji xwînerên me re hinekî qala xwe bikî?

Heyran, her ku pirseke weha ji min tê kirin, zarokantiya min tê bîra min. Zemanê ku em diçûn "okul"ê, hema bibêjî, her serê salê "öğretmen"ekî din dihat şûna yê berê û di serê darsa ewil de, bi Tirkî digot, "Ka em hev du nas bikin." Em giş li ciyê xwe ditevizîn. Divê me nav û paşnav û mesleka dê û bavê xwe jî ji "öğretmen" re bigota. Tirkiya me, têra me nedikir. Heta ku dora me dihat û me bersiva "öğretmen" dida, deng ji me yekî dernediket. Me di dilê xwe de bersiva xwe jiber dikir û em li benda dora xwe di-sekinîn. Yê ku bersiva xwe didan, dibûn mîna ku ewrekî reş di ser serê wan re derbas bûbe. Ji xwe wextê ku însan qala xwe dike hinekî jî fedî dike. Mirov dengê xwe qeyd bike û dû re lê guhdarî bike, ruhê mirov ji dengê wî/wê dihere. Wextê ku însan qala xwe dike, dibe mîna ku li dengê xwe guhdarî bike; ruhê mirov ji wî/wê diçe.

Ê, te ji me re qala xwe nekir.

Dibêjim, min qala xwe kir.

Te li zanîngehê beşa filozofiyê qedandiyê û tu li ser folklorê dixebitî. Dizanî, ez ji hewl didim ku li filozofiyê bixebitim, lê hîn ji li gorî min, di navbera wan têgehên qerrase yê filozofî û jiyana-dinyaya otantik a Kurdan de mesafeyek heye. Ez dibêjim, weke ku te ew mesafeya filozofî û jiyana-dinyaya otantik a Kurdan bi saya folklorê Kurdî, hinekî kin kiriye û filozofî û folklor hinekî nêzîkî hev du kirine. Li gorî fikra te, gelo tekiliyeke çawa di navbera filozofî û folklorê de heye?

Heyran, te barê min, hinekî giran nekir? Ez ne şaş bim, Jacques Derrida di roportajê xwe de dibêje, "Wextê ku yek tê roportajê bi min re dike, tu dibêjî qey ez fabrîkeya zanîne me, hema radibe her tiştî ji min dipirse." Ji kerema xwe, tu dikarî hinekî din ji pirsê xwe rave bikî? Belkî ez li ber pirsê te neketibim.

Ê ka ez pirsê xwe weha bipirsim; li gorî te, filozofan sûtî ji folklorê wergirtiye? Yanê, ji bo ku em, Kurd, ferhengê filozofiyê damezirînin, dikarin berê xwe bidin kîjan çavkaniyên xwe?

Îcar hinekî li ber pirsê te ketim. Filozofî û warên din ê mîna huner, wêje aborî û filan û bêvan giş, ferheng û têgeh û teşeya xwe li gorî sosyalîzasyonê wî miletî didamezirînin. Kurd miletekî şivan û

cotkar in. Bi hezar salan e ku şivantî û cotkariyê dikin. Di ziman û ramanê xwe de, tiştê ku bi ser bêjîngê xwe xistine, bi saya çandinî û xwedîkirina heywanan e. Bi saya vê, da û stendina bi axê û terş re, tiştê çêbûye. Em ji vêya re dibêjin folklorê Kurdan. Folklor, pûxteya çanda miletan e. Tiştêkî mîna filozofiyê nazîk û tenîk, sûtî jî folklorê negire dê ji çî bigire? Filozof ne koleksiyonerên folklorê ne. Narin mîna folklorîstan koleksiyonên folklorê çênakin, lê wextê ku têgehêkê damezirînin, diherin dêwla ava xwe di bîra herî kûr a miletê xwe da dadikin û avê ji bîra wê vedixwin. Ava wê bîra han, folklorê wî miletî ye.

Martin Heidegger di sala 1922'yan de dihere Todtnaubergê. Todtnauberg gundekî li başûrê Elmanyayê ye û li serê çiyayan e.

Camêr dihere li wî gundî, dikeve holikekê, wê ji xwe xwe re dike mal û tê de rûdinê. Li gund, pîrekê heye. Her ji çend rojan carekê ew û wê pîra han hev du dibînin. Pîrê jê re qala komek meselok, çîrok û çivanokan dike. Heta kesên ku li ser filozofîya Martin Heidegger dixebitin, dibêjin, wî berhemên xwe yê herî bilind, li wî gundî nivîsîne.

Ji bo ku Kurd, ferhengê damezirînin, divê berê xwe bidin folklorê. Jixwe, miletên din jî weha kirine. Sigmund Freud, destana Oidipus û Elektra ya çand û folklorê Grekan e, kire têgehêka psîkolojiyê. Tu li Hegel dinihêrî, wî jî ji peyva "pîrebok"ê, têgeha "Geist"ê damezirand.

Îroj kîjan milet bi alavên dijital dakevin, ew milet, peyv û têgehên nû li zimanê xwe zêde dikin. Tu li peyva "tweet"ê dinihêrî, wateya wê, "wît wît" a çûkan e. Rênas Jiyan di nivîseke xwe de, li dewsa, "social aggregate" (bi tirkî, jê re dibêjin "sosyal yığın") Peyva "cêz"ê bi kar anîbû. "social aggregate" peyveke sereke ya sosyolojiyê ye. Tu jî zanî ku "cêza genim" heye, "cêza nîskan" heye, "cêza ceh" heye. Pîrê kêfa min ji vê helwêsta Rênas Jiyan re hatibû. Di Kurdî de, li şûna têgeha "alienation"ê peyva "biyanîbûn"ê bi kar tinin. Tirk jî di şûna wê da "yabancılaşma" bi kar tinin. Tirkan ev peyva "yabancılaşma" ji peyva "yâbân" a Farisî wergirtine. Jixwe nivîskarê Tirk, Yakûp Kadîrî Karaosmanoğlu bi navê "Yaban" pirtûkek nivîsiye û pîr xweşik qala wê peyvê kiriye.

Îcar em werin ser peyva "alienation"ê. Mirov dikare di şûna wê peyvê de, peyva "havîbûn"ê bi kar bîne. "Havî" peyza ji mîha ku ji keriyê xwe dûr ketiye, êdî nema dikare bi keriyê xwe re be. Komek mînakên weha hene. Cegerxwîn, peyva "kêmar" bi kar aniye, lê hîn jî Kurd, peyva "kêmnêtewe" bi kar tinin. "Kêmar" yanê bi Tirkî "azînlîk." Ku mirov bixwaze, dikare ferhengên pîrê hêja yê Kurdî damezirîne. Folklorê Kurdî jî bo vêya bes e û pîr e, benderêkê bêxwedî ye. Oryantalîst û Kurdên Sovyetê pîrê lê xwedî derketin û van salên dawî Kurd giş pê hisiyane. Heta weşanxaneyên mîna Weşanxaneyê Wardozê yê ku karê folklorê dikin vebûne.

Piştî folklorê Kurdan hinek populer bû, dema min ji



Sadiq Ūskan

diya xwe biwêjeke balkêş dibihîst, hewl dida ku wê biwêje binivîsinim, lê diya min tinazê xwe bi min dikir, digot "îcar ev adeta han, ji ku derket?" Ez ji civatên min û te dizanim ku ji bo xebata te ya Payîzê (Li Ser Salnameya Kurmancî Xebateka Folklorîk) çavkaniyên te yê sereke bav û dêya te bûn. Gelo tu dikarî, ji me re, hinekî qala wê meseleyê bikî?

Bavê min heta ji lingan ket, şivantî kir û dêya min jî bi qasî bavê min bêrivantî û helêbitî kir. Min pênc salan li zanîngehê beşa filozofiyê xwend, lê roja ku min zanîngeh qedand û hatim ling wan, pê hisiyam ku belasebep ez ewqasî dûr çûme. Zanîneke pîrê hêja û delal bi dê û bavê min re bû, lê haya min jê tinebû. Belkî min beşa filozofiyê nexwenda, bi vêya nehisiyama, ew jî tiştêkî din e. Bi saya dê û bavê min û zanîna bi wan ra, li xwe vegeyriyam. Bavê min stêrkan gişan nas dike. Stêrka karwankuj, mêzî, komika sêwiya, qurix. Tiştêkî pîrê enteresan bû, dêya min jî hinek navên din li wan stêrkan dikir. Bavê min digot, "qurix" wê digot "stêrka dewkîlan." Li gorî dêya min divê jina jêhatî beriya ku "stêrka dewkîlan" hilata, ji xewê rabûya û dest bi karê xwe bikira. Ū jixwe di Kurdî û bi taybetî di zaravêyê Kurmancî da navê mehan tevlihev bû. Ev tevliheviya navê mehan ez hinekî aciz dikirim. Rabûm, bi dê û bavê xwe re li ser navê mehan xebitîm. Li dor pênc salan em bi hev re xebitîn. Her ku em bi nava meseleyê de çûn, min lê nihêrî ku baboo... Tiştên pîrê ecêb ji bin navê mehan derdikeve. Min lê nihêrî ku tew lê navê meha "nîsan"ê navê xwedawendekê ye. Wextê ku mirov dikeve nava folklorê Kurdî, bi rastî jî, mirov bawer nake ku ev folklorê han ji ber destê çandêkê însanan derketibe. Mirov dibêje belkî ew çand jî teref Xweda hatibe çekirin. Basil Nikitine, heta dawîya emrê xwe pesnê folklorê Kurdî da. Digot, folklorê ti miletî nikare bigihêje ya Kurdan. Camêr jî bo ev folklorê bê parastin, çî ji destê wî hat, tewsir nekir. Ji bo mafên Kurdan, komek name şandin rojnameyên Emerîkayê û sazîyên navdewletî. Di pirtûkên xwe de, tiştên pîrê ecêb li ser Kurdan dibêje.

► Bavê min stêrkan gişan nas dike. Stêrka karwankuj, mêzîn, komika sêwiya, qurix. Tiştêkî pirr enteresan bû, dêya min jî hinek navên din li wan stêrkan dikirin. Bavê min digot, "qurix" wê digot "stêrka dewkilan."

► Kurd û civaka Kurdan baş nas dikim. Kurd dînoke ne. Jiyana Kurdan pirr enteresan e. Kesê ehlê karê xwe yê mîna roman û çîroknûs, derhêner, wênesaz û hwd, hinekî bala xwe bide civaka Kurdan, dikare bênderek malzeme jê derxîne.

► Rênas Jiyana di nivîseke xwe de, li dewsa, "social aggregate", peyva "cêz"ê bi kar anîbû. "social aggregate" peyveke sereke ya sosyolojîyê ye. Tu jî zanî ku "cêza genim" heye, "cêza nîska" heye, "cêza ceh" heye. Pir kêfa min ji vê helwêsta Rênas Jiyana re hatibû.



Îcar em werin ser romana te ya Şampaz. Fikra ku tu vê romanê binivsi, ji ku derket?

Li welêt, min tiştên weha pirr dibihistin. Yanê xelk, pere û mal û milkên hev du pirr dixwin, serî li hev du digerin. Qey ev jî nexweşiyêke bindestan e.

Bi min, taybetmendiya sereke ya romana Şampaz, birrabbûna wê ye. Lehengên romana Şampaz, ewqas birra ne ku mirov hewl dide bîne bîra xwe û bibêje, "gelo ez van lehengan ji ku nas dikim?" Te çawa romaneke ewqas birra nivîsi?

Kurd û civaka Kurdan baş nas dikim. Kurd dînoke ne. Jiyana Kurdan pirr enteresan e. Kesê ehlê karê xwe yê mîna roman û çîroknûs, derhêner, wênesaz û hwd, hinekî bala xwe bide civaka Kurdan, dikare bênderek malzeme jê derxîne. Li ser meseleyê, derhêner Yilmaz Guney Kurd baş nas kiribû. Tu li filmên Bahma Gobadî dinihêrî, bala xwe dide filmên wî, camêr wî jî Kurd baş nas kiriyê. Alim û nivîskarên klasîk Kurd baş nas kirine û xweş qala wan kirine. Lê di wêjeya nûjen de, em kesên weha xwedî derbêna giran nabin. Belkî ji ber ku hêj jî nivîskar baş nehatibin ser hemdê xwe. Divê em dinyayê li ber çavê xwe reş nekin.

Ez bêm ser meseleya birrabbûna lehengan; bi salan e ku li ser lehengan dixebitîm. Komek pirtûk hene di derheqê çêkirina lehengan de. Ji zemanê Grekan û heta îroj, însanan serê xwe bi lehengan êşandiye. Qala çikûsan, tirsonekan, mêrxasan, jinên mîna Antigone yê serhildêr kirine. Theophrastos hêj di serdema antik de, bi navê "Leheng" pirtûkek nivîsiye. La Brûyere jî di qirnê 17'an de, bi navê "Leheng" pirtûkek nivîsiye. Ji zemanê berê de, xelkê

serê xwe li ser lehengan êşandiye.



Îcar bi ser de jî, di nava civaka me de, lehengên weha hene ku, tu bixwazî, nexwazî tu çav bi wan dikevi. Civaka me derbêna giran xwarine. Însanên wê, nivîyê pirr, bûne mîna lehengên romanana. Birra jî carna li civatekê rûdinê, çav bi hin însanan dikevim, ecêbmayî dimînim. Tu guh didî sohbeta wan, qala tiştên pirr ecêb dikin. Dibêjin, nizanim kîjan salê, min şifertiya tiran kir. Çend salan di zîndanê de mam. Dû re ez çûm, Singapûrê. Li wî dinihêre, îroj dikaneke pisîk, vekiriye, tûtina qaçax difiroşe. Ku nivîskar hinekî xwedî ceger be, û ceger bike, ew kesên ku nas dike, hinekî qala wan bike, bes e. Bi lehengên Şampazê re rûniştîm, min bi wan re hevaltî kir. Ez dixwazim vêya jî bibêjim; min Qezê (Qoser) jî mîna lehengekî, xiste romana xwe.

Em dizanin ku te senarîstiya rêzafilima Ax û Jiyana û kartonfilimên Pinik û Piya kiriyê. Di çarçoveya wan xebatên de, di avakirina karakteran da tu metodek çawa bi kar tîni û li çi miqate yî?

Min lehengên rêzafilima "Ax û Jiyana" çênekiriyê. Min bi birêz Metîn Ewr re senarîstiya wê kir. Lê min lehengên her du kartonfilman çêkirin. Ez ewilî lehengan çêdikim, dû re jî kronotoposekê ji wan lehengan re ava dikim. Li çi miqate me? Divê lehengên min bi taybetmendiyan xwe, însanên me bin. Ê te dît, senarîstiya kartonfilman warekî pirr ecêb e. Mirov dikare bibêje tu tişt jî senarîstiya kartonfilman zortir tineye. Berî her tiştî, divê mirov, bi perspektîfa kuantumê senaryoya kartonfilman binivîse. Ji bo gişan ne weha ye, lê yê me weha bûn.



Dê û bavê Sadiq Ūskan ku di dest wan de pirtûka Payîzêr (Li Ser Salnameya Kurmancî Xebateka Folklorîk) heye



► Di nava civaka me de, lehengên weha hene ku tu bixwazî, nexwazî tu çav bi wan dikevî. Civaka me derbên giran xwarine. Însanên wê, nîviyê pirr, bûnen mîna lehengên romanên. Birra jî carna li civatekê rûdinê, çav bi hin însanan dikevim, ecêbmayî dimînim.

► Dibe ku canik û camêrek, nivîskar be, lê ne rewşenbîr be. Belkî jî rewşenbîr be, lê ne nivîskar be. Ne ku dibêjim bila weha be; lê weha ye. Xwezî ne weha bûya. Hinek îstîsna hene; kesên mîna Cegerxwîn hem nivîskar bû hem rewşenbîr bûn.

Lehengên kartonfilmên "Pînik"ê û "Piya"yê lehengên folklorê me bû. Li ser meseleyê, me di kartonfilmê Pînikê de, lehengêkî tirsê bi kar anî. Navê wî lehengi "Sîngestar" bû. Û me ew jî nava folklorê kirmançî wergirt. Sîngestar lehengêkî tirsnakê ê hêla folklorê Çewlîk û Depê ye. Mîna Gurê Manco yê hêla Mêrdînê ye. Di folklorê me de, jî kartonfilman re malzeme pirr e, heta tu bibêji bes.

Ez tim behsa ferhenga Kurdistanê dikim. Ji ber ku her wate di çarçoveya welatên bindest de tiştan li xwe zêde dike, yan jî kêr dike, diguhere, dibe tiştêkî din. Bi min, li mêtîngehan, kêr-zêde rewş weha ye. Bi te rol û mîsyona rewşenbîriyê li welatekî mîna Kurdistanê çi ye?

Ji pîrsa te xuya ye ku tu rewşenbîr û nivîskaran tevli hev du dikî. Divê em di serê peyva xwe de, vê meseleyê jî nava hev du derxînin. Dibe ku canik û camêrek, nivîskar be, lê ne rewşenbîr be. Belkî jî rewşenbîr be, lê ne nivîskar be. Ne ku dibêjim bila weha be; lê weha ye. Xwezî ne weha bûya. Hinek îstîsna hene; kesên mîna Cegerxwîn hem nivîskar bû hem rewşenbîr bûn. Jixwe tu ji min bipîrsî, ez dibêjim Kurd pirr jî li nivîskarên xwe guhdarî nakin. Tu dev jê berde, haya însanên me, zêde ji nivîskarên wan tineye. Xwendin û nivîsandina Kurdan, hema bi-bêje, tine ye. Du sê zanîngehan dixwînin, lê nikarin navê

xwe bi Kurdî binivîsin. Li ser meseleyê, malbata min bi xwe jî nikare pirtûkên min bixwîne. Belkî du sê îstîsna hebin, pirtûkeke min xwendibin, ew jî tiştêkî din e. Nîzain bi Kurdî bixwînin. Kurdiya wan gelekî baş e, lê xwendin û nivîsandina wan a Kurdî tineye.

Ez dibêjim, seydayên me, rewşenbîrên me ne. Xelk li wan guhdarî dike, xatirê wan digire. Seyda, ehlên civatan in û retorîka wan jî baş e. Di nava gel de ne. Bi derdê wan dadikevin. Mêvan ji mala wan kêr nabin. Hezar û pênc sed pîrsgirêk û girêkûtikên nivîskaran hene. Jixwe, gel jî rast bi rast, daxwaza rewşenbîriyê li wan nake. Li ber çavên xwendevanan bi xwe jî, nivîskar hinekî magazinê in.

Di nîqaşên kolonyal û postkolonyal de, nîqaşek heye, dibêjin, gelo li mêtîngehan mirov dikare tenê bibe nivîskar? Yanê, li mêtîngehan, nivîskar, nivîskar e, yan şoreşvan e? Ez dibêjim, bi awayekî bi dizî ev nîqaş di nava me de jî heye. Bi qasî ku dibînim, Kurd, doza rewşenbîriyê li nivîskarên xwe nakin, doza şoreşvaniyê li wan dikin. Nivîskar jî ne dibêjin, em şoreşvan in û ne jî dibêjin, em ne şoreşvan in. Heta ez gelek caran lê rast hatime ku nivîskar dibêjin, em ne nivîskar in jî. Gelek nivîskarên Kurd bi çavên ku ew nivîskar bin, li xwe nanihêrin. Jixwe, li welatekî ewqas rewşenbîr jî tine ne. Li hin welatan hema bibêje, qet rew-

şenbîr tinene. Ku li welatekî rewşenbîrê hebe, bes û pirr e. Ew yekê/a han rêyekê vedike û yên din lê zêde dike. Zemanê ku Cezayîr mêtîngeha Fransayê bû, Jean Paul Sartre, rewşenbîr bû û ez dibêjim, hewceyî rewşenbîrêkî din jî nedikir. Edward W. Said jî di doza Filistinê de rûniştibû. Heta di sala 2000'î de çend kevîr jî di ser sînorên Îsraîlê re avêtibûn eskeran. Hey me qala Edward W. Said kir, peyveke wî ku derheqê rewşenbîran de gotibû, hat bîra min. Dibêje, "Rewşenbîr bê cih û war e" Ez jî dibêjim, rewşenbîr wardoz e, ne nivîskar e.

Kesên ku romana Şampaz xwendibin, bêguman niha li benda romanên nû ne. Ti proje li ber destên te heye?

Erê, em hatin pîrsa "fîks menu"yê! Heyran, ma te jî ev pîrsa han kir? Xuya ye ev pîrs, pîrsa herî dawiyê ye.

Ez dibêjim, xwendevanên Kurdî, niha teqez meraq dikin, bê gelo tu tiştêkî dinivîsî, yan na?

Romaneke nû, dinivîsim. Hem bêhna min ji nivîsê re fireh e û hem jî hin pîrsgirêk hene ku min asteng dikin, nahêlin zêde li nivîsîna wê germ bibim.

Rêxistineke çand û perwerdeyê: Gehandinî

Berîya em behsa rêxistina "Gehandinî" bikin divê em hinek behsa jiyana û serpêhatiyên Ebdulrezak Bedirxan bikin. Ji lewma çûyina Ebdulrezak Bedirxan ya Rojhilatê Kurdistanê û damezirandina rêxistina "Gehandinî" ancax bi vî awayî were fêhmîkirin. Ebdulrezak Bedirxan yek ji pêşengê ronakbûna Kurdan e û li gor wê demê miravêkî jêhatî û serwest bûye. Li ser jiyana û xebatên wî lêkolîn hatine kirin û çend pirtûk jî hatine nivîsandin lê rêxistina bi navê "Gehandinî" mixabin zêde nehatiye bihîstin (Qet nebe ez di vî fikrê de me). Ji ber wê min xwest bi nivîseke kurt be jî behsa vî rêxistinê û armancên wê yê ji bo Kurdan bikim.

Ebdulrezak Bedirxan di sala 1864'an de li Stenbolê tê dinyayê. Kurê Necîb Paşa û neviyê neviyê Mîr Bedirxan e. Di ciwanîya xwe de çûye Ewropa xwendiyê û gelek zîmanan hîn bûye. Nexisim jî hînbûna Fransî kiriye ku ew li ser wê jî nivîskar û fikrên rewşenbîrên Fransî hûr bibe û ev yek bergehek fireh pê re çêkiriye. Lê ji hêla walatperwerî û Kurdayetiyê ve kesê ku ew perwerde kiriye Hecî Qadirê Koyî ye. Bi saya wî hêz û hizreke netewî lê peyda bûye. Serpêhatiyên bi serê malbata wî û Kurdan de hatine jî baş xwendiyê û jê dersên baş derxistiyê. Piştî li Ewropa perwerdeya xwe bi dawî dike vedigere Stenbolê. Ji Stenbolê jî diçe Rûsya û di balyozxaneyê Tirkîyeyê de dest bi kar dike. Piştî wî li balyozxaneyê Îranê jî dixebite. Lê ji ber xebatên xwe yê Kurdewarî tim di bin çavan de bûye û îstîxbarata Padîşahên Osmanî tim li pey bûye. Ebdulrezak Bedirxan di sala 1894'an de direve bajarê Sivastopol û ji wir jî derbasî Tiflîsê dibe. Lê padîşahê Osmanî Evdilhemedî bi awayekî dîsa wî tîne Tirkîyeyê û li wir di serayê de peywîrdar dike.

Di sala 1906'an de Ridvan Paşa e ku wê demê şaredarê Uskudarê ye tê kuştin. Piştî kuştina wî fermana gelek Kurdên ku li Stenbolê dijîn derdikeve û belesêbep gelek Kurdên ku di sazîyên dewletê de peywîrdarin bi vî kuştinê tîne tawanbar kirin. Ebdulrezak Bedirxan jî yek ji van kesan e. Bedirxan vî rewşê di jînenîgariya xwe de wiha rave dike, "Bi qasî 3 hezar Kurd ku gelek ji wan Bedirxanî û xizmên wan bûn hatin girtin. Hêdî hêdî, gelek xwarzîk û biraziyên min yê li bajarên Tirkîyeyê yê cuda diman hatin girtin. Yê negirtin jî wan şandin sirgûniyê. Min jî desteser kirin û tevî qeyd û zincîran avêtin zindanê." Ebdulrezak Bedirxan paşê sirgûnê Libyayê ango Trîpolî dikan. Di sala 1910'an de efû derdikeve û Ebdulrezak Bedirxan bi vî awayî serbest tê berdan.

Ebdulrezak Bedirxan li Stenbolê bi serokê balyozxaneyê Rûsyayê Çarîkov re têkiliyên xwe çêdike û dixwaze Rûsya wî weke penaberekî politîkî qebûl bikin. Piştî gelek hewldanan Ebdulrezak Bedirxan di sala Tiflîsê û demek li wir dimîne. Rûsya wî qebûl nake lê rê dide ku ew biçe li Xoyê bi çî bibe û jiyana xwe li wir dewam bike. Bedirxan li Xoyê Simkoyê Şîkak nas dike û dixwaze bi riya rêxistina "Gehandinî" dibistanan veke û li wir çand û perwerdeya Kurdî saz bike.

Li Xoyê ava kir

Ebdulrezak Bedirxan beriya Şerê Cihanê yê Yekem li Xoyê bi piştigiriya Simkoyê Şîkak û konsolê Rûsya yê Xoyê Çîrkov xebatên çand û perwerdeyî bi rêve bir. Ji bo siberojê dixwest xwendekarên Kurd bi çand û zîmanê Kurdî bigihîne ango perwerde bike. Dixwest Kurd jî weke miletên din perwerde bibin û di vî warî de pêş bikevin. Di dawîya sala 1912'an û destpêka sala 1913'an de li Xoyê rêxistina "Gehandinî" ava kir û di bin banê vî rêxistinê de dibistaneke Kurdî vekir. Bedirxan pêşengiya vî rêxistinê



Di dawîya sala 1912'an û destpêka sala 1913'an de li Xoyê rêxistina "Gehandinî" ava kir û di bin banê vî rêxistinê de dibistaneke Kurdî vekir. Bedirxan pêşengiya vî rêxistinê dikir û dewlemendên Kurd jî di hêla aborî de piştigiriya vî rêxistinê dikirin.

dikir û dewlemendên Kurd jî di hêla aborî de piştigiriya vî rêxistinê dikirin. Rêxistinê dixwest bi riya vî dibistana ku ew ê vekir, rojname û kovareke bi Kurdî derbixe, alfabeya Kurdî hazir bike û jî bo ciwanên Kurd bigihîne seyahetan organîze bike û wan bibe Rûsyayê. Wêkî di din jî bo siberojê jî dê atolyeyan vekira û hîlebrînerî pêk bihata li van dibistanan. Rêxistinê ev armanc dabû pêşîya xwe û jî bo van armancên xwe pêk bîne bi balyozxaneyê Rûsan re di nav têkiliyê de bû û dixwest ew statûyê fermî bidin vî dibistanê da ku karibin bi rehetî kar û barên xwe bi rêve bibin.

Ji bo ev dibistan neyê vekirin û têkiliya Kurd û Rûsan xera bibe hêzên girêdayî dewleta Tirkîyeyê û Îranê propagandeyek ne baş dikirin û digotin ku Simkoyê Şîkak bi darê zorê jî xelkê pereyan kom dike. Lê Çîrkov jî Tehran, Tiflîs û Petersburgê re name û telgirafan dişîne û dibêje rayedarên Îranê naxwazin ku Kurd pêş bikevin. Vê nêzikatiya wan weke dijminatîyê bi nav dikir û nahêle ev kes li hember vî dibistanê bibin asteng. Li gel hemû astengiyên dibistan vedibe. Dibistan dibistaneke modern bû. Odeya mamosteyan û polên ku jî bo 30 şagirtî hatibûn çêkirin hebû. Her wiha dîspanserî jî hebû di nav dibistanê de û hemşîreyek jî hatibû peywîrdarkirin.

Dibistan, bi beşdariya generalê herêmê yê Rûsî Veselovsky, karmend û pêşengê civakê bi merasîmekê, di 22'ê Cotmehê de vedibe. Çîrkov roja vekirina dibistanê wiha tîne zîman; "Di 21'ê Cotmehê de Simko jî Çiyarîk, Somay, Biradost û jî Hoydarê 29 zarokên Kurd anî Xoyê. Ev şagirt eynî weke dibistanên Ewropî bi cilên dibistanê û li pey hev rêz bûbûn. Şagirt di nav bajêr de li gel artêşa piçûk ya Simko ku jî 40 siwariyan pêk dihat bi serbilindî meşîyan ber bi dibistana xwe ve. Qerabalîxa li kolanê ya ku jî Îraniyan pêk dihat û Kurdan weke "kûviyên çiyê" diditin li ber vî meşê rêz digirtin û rê vedikirin jî xwendekar û siwarên Simko re."

Di navbera Ebdulrezak Bedirxan û Simko de niqaş derdikevin

Piştî dibistan vedibe di nav Kurdan de gelek deng vedide. Tenê ne Kurd her wiha heya Stenbolê jî ev xeber diçe. Rojnameyên Tirk û Ermen behsa vî yekê dikin. Ji bo

tesîra Rûsan li ser Kurdan zêde çênebe û têkiliyên di navbera wan de xera bibin Jon Tirk dîsa derdikevin holê dibêjin jî bo perwerdeya Kurdan me pereyan veqetandiyê û em ê li hin herêman dibistanan vekin. Lê armanca wan jî vî yekê ne perwerdekirina Kurdan bû berovajî vî yekê wan dixwest li hember vî pêşketinê bibin asteng û nehêlin Kurd bi dewletên din re têkiliyên xurt ava bikin.


Lê beriya ew bibin asteng, rêxistina "Gehandinî" bi xwe di nav xwe de pirsgerêkan dijî û niqaş derdikevin. Li gor agahiyan Celîlê Celîl di pirtûka xwe ya "Ronakbûna Kurdan" de tîne zîman di navbera Ebdulrezak Bedirxan û Simko de niqaş derdikevin. Bedirxan dixwaze piştigirî û aboriya jî bo dibistanê hatiye komkirin jî rêxistinê çêdar yê Kurdan re bişîne û alîkariyê bide wan. Simko jî li hember vî yekê derdikeve û dibêje ev nêzikatiya te bê mane ye û armanca te pêk nayê. Lê Bedirxan lê guhdar nake û bi ya xwe dike û pereyan ku hatine dişîne jî hêzên Kurd re. Nexisim jî yê dixwazin li hember Jon Tirkan tîbikoşin û şer bikin.

Bi vî awayî otorîteya rêxistina "Gehandinî" hildîweşe û dibistana hatiye vekirin nikare xebatên xwe yê çandî û perwerdehiyê bidomîne. Gelek xebat û xeyal nivco dimînin. Ji xwe piştî Şerê Cihanê yê Yekem destpê dike rêxistina Gehandinî jî belav dibe. Her çend armanc neçûbe ser jî avakirina dibistaneke bi vî rengî roleke dirokî listiyê û hewldana Kurdan ya jî bo perwerdeyê baş radixe ber çavan. Perwerdekarê Sovyetî O.L. Vilçevckiy jî rêxistinê wiha dinirxîne; "Rêxistina Gehandinî jî bo çanda û perwerdeya modern ya Kurdan roleke girîng listiyê. Siyasetmedar, civak û sazîyên Kurd li vî rêxistinê xwedî derketine."

Rêxistina "Gehandinî" yek ji karê Ebdulrezak Bedirxan û Simkoyê Şîkak yê herî baş e. Ev hewldana wan baş radixe ber çavan ku jî bo çand û perwerdeya gelê Kurd pêşengî kirine û xebitîne. Her wiha wan bi van xebatên xwe dijminatîya dewleta Tirkîyeyê û Îranê ya li hember Kurdan jî derxistiyê holê. Ji xwe ev dijminatî (Jon Tirk) dike ku Ebdulrezak Bedirxan di sala 1918'an de were girtin û paşê jî were darvekirin. Dewleta Îranê jî di sala 1930'yî de Simkoyê Şîkak tevî kurê wî Husrew vedixwîne Îranê û paşê jî wan dîkuje.


Çavkanî:

Celîlê Celîl-Kürt *Aydınlanmasi-Weşanên Avesta-2001*
Failî Meçhul Kurbanî *Bir Bedirhan-Malpera Bernamegeh*



Ardîn DÎREN

Ji çavê nivîskarekî Elman Sureya Bedirxan



İbrahim BULAK

- Navê nivîskarê Elman, Kurt Aram e -maxlasê wî ye, fermî navê wî Hans Fischer e- û gelek romanên wî hene. Wî û Sureya Bedirxan hevdu li Stenbolê nas kiriye ku hingî emrê Sureya Bedirxan 30 û tiştê e.

Hin kesên di nav dîroka Kurdan de cihê xwe hene, hema bêje ji xeynî xebetên wan ên siyasî û kulturî ti agahiyên dîtir li ser wan tinene. Nexasim li ser aliyên wan ên insanî em bi pîrr tiştan nizanin, sermeselê ka di nav malê de ew dê yan bavekî çawa bûn, di nav rojê de rûtîna wan çi bû, ji bo ger û geştê diçûn kû derê û hwd. Helbet ew jî ne wekî em di wêneyên wan de dibînin, bêliv û statîk bûn. Pîrsa "Wî ji bo Kurdan çi kir?" li pêşiya pîrsa "Ew yekî çawa bû?" ye, ew jî ne tiştê ecêb e. A rast, bersiva pîrsa diduyê pariyek karê biyografîk e, lê herçî di nav Kurdan de xebetên biyografîk in, dîsa bi piranî bi pîrsa yekê serê xwe êşandine.

Niha di vê nivîsê de em ê berê xwe bidin Sureya Bedirxan û ji çavê nivîskarekî Elman, em ê jiyana wî ya rojane hebekî nas bikin. Sureya Bedirxan, nexasim di dewra xwe ya Xoybûnê de bi berhemdariya xwe derket pêş.

Ew nivîsa niha hûn ê bixwînin, sala 1924'an (1 Îlon Nr. 9) Xeberên ji Yekîtiya Şervanên li Asyayê (Mittelungen des Bundes der Asienkaempfer) bi zimanê Elmani li Berlînê çap bûye. Bund der Asienkämpfer piştî ku di Şerê Cihanê yê Yekemîn de piştî Elman-yayê şikiya, ji alî xazî û kevneleşkerên Elman ve hatibû damezirandin ku xwe wekî saziyeke alikariya insanî bi nav dikir. Naziyan sala 1938'an ew saziya hanê belav kir.

Navê nivîskarê Elman, Kurt Aram e -maxlasê wî ye, fermî navê wî Hans Fischer e- û gelek romanên wî hene. Wî û Sureya Bedirxan hevdu li Stenbolê nas kiriye ku hingî emrê Sureya Bedirxan 30 û tiştê e.

Ew di nivîsa xwe de navê wî tenê weke 'Sureya' hildide, lê mirov gava bi xwendina nivîsê dadikeve, hingî tê derdixê ku ew kes ji Sureya Bedirxan pê ve ne mumkin e kesekî din be. Em vê carê ji çavê Kurt Adam (1869-1934) Sureya Bedirxan nas bikin ku wî bi berhemên xwe û çend wêneyên xwe di dîroka Kurdan de cihê xwe girtiye. Em bêhtir wekî her insanekî, insanekî Kurd nas dikin.

Sureya

Tenê navê wî ez ê li vir hildim ku di nav Kurdan de ne kêmtir e ji navê Hans ê di nav Elmanan de. Ez hêvî dikim, ew û jina xwe hê sax in li Stenbol an li Kurdistanê. Ew ji min re hevalên qenc bûn, herhal çawa ku min ew zêde ji bîr nekiriye, wî jî ez kêmtir ji bîr kirime tevî ku bi dehan salan di ser re bihurîne ku ez li cemê bûm û me xeber ji hev negirtine.

Bes li Rojhilat mirov wî zû ji bîr nake, ji ber ku tiştên baş û xerab gişan her wiha ji bo hevaltîyê û bibîranînên hevpar hafizeyeke xurt heye ji welatên dîtir ên xwedan telefon û trênen zû. Min ji nasekî Faris ku pîrr baş sûret digirtin, rica kiribû da ku heger tiştên ecêb biqewimin, bo min qeydiyên wan bigire. 12 sal di ser re bihuribûn, rojê havîna 1917'an li Sofiyayê kete odeya min, heçku em qet ji hev dûr neketine, û ji min



re resmên xweşik ên salên ji mēj bihurî yên şoreşgerên Fars û Rûs anîbûn.

Sureya endamekî yekê ji wan komên Kurd ên piçûk bû, yê ku fena Jontirkan, bi pîrranî li Parîsê xwendina xwe kiribûn û şaristaniya Ewropayê nas kiribûn. Wî li Stenbolê bi avakarên kovara ewil a bi zimanê Kurdî heta pê re diviyavabû tîpên Kurdî ji bihatana rijandîni qaliban, ew heta hingî tinebûn. Mixabin ew kovar paşê ji ber hindikbûna xwendevanên zimanê Kurdî, dîsa têk çûbû. Hewldana diduyan bû ku wî bi eşq dixwest navmala xwe bike Ewropî. Di orta vê reforma hanê de me hevdu nas kir.

Ew yekî jîr û zirav bû. Bejna wî ne kin ne dirêj, emrê wî sî û tiştê, porê wî keş û çavên wî gewrikî bûn ku di nav Kurdan gelek tîpên dîtir. Wî zûzûka gazî min kir da ku ez biçim serdana wî, ew yek bo min jî xweş bû ji ber hingî ne wilo rehet bû yekî Ewropî biçûya mala çawa Ewropî dibêjin, 'burjuvayekî baş' ê Misilman. Ew li Stenbolê li kuçeyekê li cem Kapalı Çarşı xaniyekî rûdinişt ku xanî ji texteyê yê ûsila Tirkên berê bû, paceyên pêşiyên wan jî ji qefesên textik girtî bûn ku li ber çavên Ewropîyan xerîb û bi sîr xuya dikin. Her wiha ne dîrî Ayasofyayê û Şerefiye Sarnîcî bû ku erdên kevn ên biqedr ên Bizansa qeyserî bûn.

Şewqa hingorî ya havînî xwe berdabû nav xênî. Ez ji derenceyan bi zehmetî ketime cihê ku odeya pêşwazîkirinê, odeya rûniştinê, odeya xwarinê, odeya xewê a xwediyê xanî tê de bûn. Çend dîwan û sindoqên kevin li kêleka dîwaran disekinîn. Di orta odê de maseyek û sê sendeliyên şixûlê modern tê de hebûn. Li erdê xaliyê xweşik, li diwaran çend silehên kevn û çarşefên hevrişimî ên rengorengo hebûn. Ecêb xweş hênik bû hûndirê odeya nivîtarî ku ji bo germa havînê ya derve zaf rind û kêrhatî ye.

Sureya destê xwe li hev xist û xizmetkareke jin a




pîr qehwe anî. Jixwe cixara xwe pêxistibû. Wî bi eks bi jinê re xeber dida, wê jî her bi awirên tirş û tehl li min mêze dikir. Nîqaşeke nexweş bû ku paşê xwediyê xênî bi destê xwe îşareteke hikumran da û bi dawî kir. Vê kêlikê min jî xwe nerehet his kir. Piştî çendekî xanima malê jî xuya kir, Tirkeke xwînciwan, serqot bes kenara şara ku li stûtê wê bû, dabû ber devê xwe. Xwe da naskirin, wilo bi rengekî Ewropî meşî; jina ciwan bi Fransiyekê qise kir ku herhalî ji ya min çêtir û tevî ku ew hîç li Ewropayê jî nemabû. Carna Sureya çend xeberên Kurdî davêtin ortê û jina ciwan lêborîna xwe dixwest û şara xwe dîsa dibir ber devê xwe da ku xuya neke. Vê yekê çendbare kir. Sureya aciz bûbû û jina ciwan jî qehêrî. Paşê ez di meseleyê gihîştim, wê xwe hînî vê yekê kiribû ku li cem zilamên xerîb serqot xwe nîşan bide, bes hîn nebûbû li gorî adetên Misilmanan ku xwe ji bêhna zilaman biparêze. Tu nabê, ji ber vê yekê bû acizîya Sureya û qehra xanimê. Ez jî di vî karî de bûbûm kobayek ji bo ceribandana reformên Ewropî yê ji bo malxê malê.

Piştî Sureya soz da min ku ew ê careke din min wekî kobay bi kar neyîne û destûrê bide jina xwe, ez dîsa çûm mala wan. Xanim ecêb bedew bû. Min serekî wilo esil nedîtibû. Tu bêjî qey profîla jina Camee Gonzaga ya navdar a li Petersburgê bû. Ji bo min wekî mêr hema bêje kêfêkî mezintir bû dîtina wê ji xebardana pê re. Ez dilketibûm wê. Lê bi qasî min Rojhilat nas kir, min dizanî ew ê tenê bibe dilxweşiyeke pak a xeyalî û her wisa bimîne, çawa nabe Tirkeke bawermend bi yekî ne Misilman re hevaltîyê bike, bi heman rengî çawa nabe Cihûyê ortodoks bi yekî ne Cihû re. Her du dîn jî qewî û teqez dikin meyla nijadî, her wiha li cem wan ûsilên navmalê û paqijiyê vehugerîne rêûresmên dînî. Ew ferqa wan a ji Xirîstyanîyê ye ku bi ya min ne tiştêkî xerab e.

Em bûbûn hevalên hev ên baş û gava jina ciwan bi xizmetkara malê ya pîr re di destpêka havînê de diçû Kandîlî, heta min soz nedaya ku ez heta ew vegere biçim mala mêrê wê, bela xwe venedikir; mêrê wê piştî vê daxwaza jina xwe digirt, lê ne bi germiyê ku mirov ji rojhilatîyê hêvî bike. Kêfa min gelekî ji vê kirina jina ciwan re dihat û vê yekê dilê min xweş dikir. Ji bo wê, sebebên wê yên taybet û birastî ji bi jinbûnê re elaqadar hebûn çawa ku paşê derket holê.

Çaxê min koça xwe bir cem Kurdan, min xwe hazir kiribû bo meseleyên navmalê jî. Min oda jina wî dît ku ji bêhna textik û ava gulan mirov ji hişê xwe ve diçû. Şûşeka parfûmê a li ser maseya tuwaletê ez xeyalîkeştî kirim ku min digot qey ew bêhn ji nava Asyayê hatiye, tu nabêji ji fabrikeyê li Leipzigê ye. Xwedêwo! Ew xalîçe û çarşefên li diwaran çî xweşik û dewletî bûn, ew diwana bi gelek balgîfan ku li odeya malxê malê bûn. Lê seba min tiştê ez matmayî hiştim ew bû ku midbex hingî biçûk bû bi zorê du mirov dikaribûn biketanê. Têde ocaxeke biçûk, çendek kûp û sêlek ji bo berû û fistiqa bipijînin, hebû. Li ser ocaxa biçûk tenê qehwe hate çêkirin û av hate kelandin, lê ti xwarin nehat çêkirin. Xwarin ji bo xênî ji nappêjê derve ê herî nêzik dianîn. Ew xanima hanê bi teşqelaya karê malê re hindiktir mijûl bû ji xwişkên xwe yên Ewrûpî. Di bin derenceyan de ji bo xizmetkar odeyêke biçûk, du çavik û cihekî tişt miştan hebûn. Nava rojê hindûrê xanî nivtarî û bêdeng bû. Tenê li kêleka midbexê xuşexuşe ava kaniyêke biçûk diherikî nava hewşikê. Mirov digot qey ne di vê germa Stenbolê de ye, lê heçko li ser stêrkeke dûr, hênik û bêdeng e. Bes kûçikan bi şev ev rehetî xera dikir.

Meha rojîyê hatibû, ya ku tê de xwarin nedihat xwarin heta ku roj neçe ava. Lê cixare nekişandin ji nexwarinê xerabtir bû. Sureya ne Mislîmanekî sofî bû, ji bo rojî jê re zehmet nebe, jixwe re nivro jî radiket, bes kurmê cixarê zor dida wî. Xanim û xizmetkar li Kandîllî bûn. Gava roj diçû ava Stenbol şên dibû. Hema çawa muezîn êvarê bang dida, li her cihî derî vedibûn, bawermedan bi kêf hilma pêşî a dûyê cixarê dikişandin hinavên xwe.



Hingî Stenbol dişiba bazara ku salê carekê tê çêkirin ku şên, lê ne wekî Ewrûpayê zêde teqûreq hebû. Ala, destmal û kaxizên rengorengo li her derê hatibûn daliqandin li her koşê û quncikêke tiştê dihat sorkirin û pijandin. Heta şevê xwarin û cixare kêr nedibûn. Her nappêjê xwarineke taybet çêdikir û di vê Remezanê de hema bêje her danê êvarê min şîva xwe bi xweşaveke dawî kir ku ji pelên gulan dihat çêkirin. Bawer nakim tehma Ambrosia (di mîtolojiya Yewnan de xwarina xwedayan e, Ewrûpî ji bo xwarinên gelekî tahm xweş bi kar tinin î.B) jê xweştir be.

Mirovî li ti deran jin nediditin, bes cihê ku jin lê ne, di vê şeva hanê de Xwedê dizane, ka çendî şêntir û deradetî bû. Serê vê mehê bû, Sureya şevêke gunehên xwe ji me re gotin, ew û jinebiyêke ciwan a ji taxê nêzikî hev bûne ku wê bi dizika gelek caran jê re xeber şandine. Di vê meselê de min ê çî bikira? Qesta min jê, bûyerên bi vî rengî min kêr nas dikirin û diviyabû pêşî min xwe hazir bikira. Niha, ew jinebiya ciwan êdî ne tenê ji taxê ye, êdî parçeyek ji malê ye. Ew dizane, jina Sureya bi xizmetkara pîr re li Kandîllî ye û Sureya ji bo bê serdana wê şandîye wir. Min digot, ji bo Sureya gavek bavêje, ne yekê gumanbar lê wekî ji malê be tevdiqerîya. Sureya ji min re zelal dikir, li vê dera hanê xeter e, ji ber ku di navbera merivên nêzik û dûr de hewesdariya wilo pîr in, seba ku têkilîdanîna vê rehetir e. Hingî mêvan diherin û tîn ku ew jî meriv, kom û kulfetên hev bûn, herçî dilê yekê li ser yekî be, hingî dikare wî nas bike. Bi xwe li cem jina wî jî hestên şikber peyde bûbûn li dijî vî jinê ji ber ku bûbû çend sal zef dihat serdana wan. Ka dilê wî li ser vî jinebiya ciwan hebû? Ew bedew, ciwan û henokoyî bû lomanê ji çîma na? Niha ez difikirim, ew li gorî exlaqa Xirîstiyani, na eleqa wî pê re tune, lê qeydeyên Quranê bo vî bûyerê çî ye, çî ferman dike, an jî li ser bûyereke wisa qeyd û şertên wî hene, min ew yek hanê yekcar nedizanî.

Lê min xweş dizanî ku Sureya ji wekî Kurdên dîtir ên ku min ew nas kirine, ne fena Tirkeki kevn olperest bû, û xwedê dizane Parisê jî di vî xisûsê de ew nekiriye zilameki exlaqperesttir. Lê niha? Di neqeba teorî û pratîkê de eynî li Ewrûpa jî ferqeke pîr mezin heye. Lê pîrên ku zilamê Ewrûpî ji bo vî yekê çêkirine, ez dibêim qey ji bo Asyayê bi kêr nayên.

Sureya digot, ew tişt ji ber ku jinebiya ciwan li taxa kêlekê rûdinişt, xasme xeter e. Jixwe, jineke pîr her di kemînê de ye û belkî jina wî jinek wezîfedar kiribe ji bo vî tiştî. Erê wilo, heger jinebiya ciwan li wî aliyê, li Kum Kapi yan li Et Meydan bi-mîne [dibû], lê bi vî hawî....

- Ew nivîsa niha hûn ê bixwînin, sala 1924'an (1 Îlon Nr. 9) Xeberên ji Yekîtiya Şervanên li Asyayê (Mitteilungen des Bundes der Asienkämpfer) bi zimanê Elmanî li Berlînê çap bûye. Bund der Asienkämpfer piştî ku di Şerê Cîhanê yê Yekemîn de piştî Elmanyayê şikiya, ji alî xazî û kevneleşkerên Elman ve hatibû damezirandin ku xwe wekî saziyêke alikariya insanî bi nav dikir.

Heger meseleya hanê ew qasî xeter be, çîma hema bela xwe jê venake? Sureya kenî, bi ya wî li aliyê din cezbeke wê ya taybet heye. Min jê pirsî, ka esas tiştê xeter a vî yekê çî ye? Wî li xwe eşkere kir, ku jina wî ecêb ji zemanê berê ye, çawa min jî ferq kiribû, û gelekî hesûd e. Heger ew pê bihise, wê li malê hizûra wî nemîne. Ez jî hingê beşişim, ji ber ku ez fikirim çî li Ewrûpayê çî jî li Asyayê, tîrsa ji behizûrî û aciziyê li her derê stûna herî xurt a exlaq e. Lê paşê ez bi xwe jî aciz bûm, ji ber ku heger wî yê ew bi jinebiya ciwan a herî baş a pêşî bida, vî zilamî jineke wilo bedew heq nedikir. Çawa acizîya min zêde bû, wêrekiya min jî wilo zêde bû ku ez weazên exlaqî yên qeydeyên Ewrûpî bidim. Vê yekê tesîreke ji ya ez li bendê zêdetir li ser wî çêdikir û em bi roj û şev li cem hev bûn, ez lê miqate bûm ku ew nehere cem jineke din. Gava ku jina wî vegeriya, ew bi awayekî xuya be rehet bûbû ku xeter bihûriye û niha min nas dikir ji ber çî wê jina ciwan ewqasî bi îsrar ji min rica kiribû ku ez bar bikim cem mêrê wê. Bi ajoyên xwe ewle, vî jinê beriya min dizanî ku ji ber meyla min a ji bo wê jî be, ku ez ê notirvaniyêke baştir ji pîrejineke bi pereyan bikim li Sureyayî. Bêyi ku em her sê jî gotinekê bikin, di cih de me ev yek fêhm kiribû. Ji ber vî yekê ez bawer dikim, çawa ku min ew ji bîr nekiriye wî jî ez jî bîr nekirim. Dibe ku serboriya me ji bîra wê jinê jî zû ve çûbe, lewma di vî meselê de û belkî tenê di vî meselê de mêr xwedî hefizyêke çetir in.

Dengê wî çiyayên Kurdistanê hejandin:

Murat Bektaş

► Tê bîra min li Urmiye, Mehabad, Zêwe, Sine, Kirmaşan, Îlam û gelek dever û bajarên din ên Rojhilatê Kurdistanê her roj kê-m-zêde du kaset ji Bakurê Kurdistanê digehîştin destê studyoyên firotina berhemên muzîkê û ji rûyê kasetekê hezaran kaset kopî dikirin û difirotin dilxwazên dengên nûbihîstî.



dipirsi: "Ev Şivan Perwer e yan Murat Bektaş?"(1)

Di sedsala derbasbûyî de ji destpêka salên 90'î û şûnde piştî bédengiyêke trajîk êdî liv û lebateke nû li Bakurê Kurdistanê dest pê kir. Serokkomarê demê Turgut Ozal (1927-1993) sala 1991'ê li ser azadiya zimanê Kurdî axivî, lê çiqas bawerî bi gotinên xwe hebû yan jî çendî bi Kurdan re rûrast bû, mijareke cuda ye ku carê li ser nasekinim. Ya girîng ew bû ku ji hêlekê şoreşa li Bakurê Kurdistanê û şerê çekdarî, ji hêla din jî zextên rêxistinên mafên mirovan li dijî siyasatên dewleta Tirkîyê û kiryarên wan ên hovane li Kurdistanê ew neçar kiribûn ku bêjin êdî "zimanê Kurdî azad e". Ew biryar encama ked û xwîna hezaran şehîdên doza Kurdistanê bû ku li her derê diqêriyan: "Ji serxwebûn û azadiyê bi rûmetir tiştêk tune".

Bi vê rewşê ve girêdayî pêleke mezin ji ciwanên Kurd ên dengxweş ketin nava qada hunerê û bi Kurdî stran gotin. Di şahî û dewatan de êdî dengê stranbêjên Kurd meydan nedida wan kesan ku dixwestin bi Tirkî bistrên. Li Kurdistan û metropolan jî her dera Tirkîyê ku akinciyên Kurd lê hebûn, êdî eşkere dewatên xwe bi stran û awazên Kurdî pîroz dikirin. Ev bi serê xwe bû sedema destpêkirina "pêvajoyêke nû" ku "generalên faşîst û neteweperestên Tirk" tirsandin, lê êdî kar jî destê wan jî derketin. Her roj çend keç û xortên Kurd derdiketin û ji ber "germbûna bazara muzîka Kurdî" û "pêşwaziya gel" firmayên tomarkirin û belavkirina kaset û pişt re CD'yên Kurdê jî ketin gerê. Van berhemên han bandoreke mezin li ser Kurdên parên din ên Kurdistanê jî çêkir. Tê bîra min li Urmiye, Mehabad, Zêwe, Sine, Kirmaşan, Îlam û gelek dever û bajarên din yê Rojhilatê Kurdistanê her roj kê-m-zêde du kaset ji Bakurê Kurdistanê digehîştin destê studyoyên firotina berhemên muzîkê û ji rûyê kasetekê hezaran kaset kopî dikirin û difirotin dilxwazên dengên nûbihîstî. Ew deng û stran ji xeynî dayîna mizgîniyên xweş li ser bilindbûna dengê şoreşa Bakur li Rojhilat jî bûne sedema şikandina hinek tabuyên ku me jî nediwêra xwe nêzî wan bikin.



Kakşar OREMAR

Naveroka berhemên wan

Berhemên dihatin gotin, bi pirranî teqlîdî û tiştêkî zêde nû jî ji bo bihistinê di nava wan de nebû, lê naveroka berhemên wan salan jî bi pirranî li ser Kurd û Kurdistan yan jî wê dozê bûn ku bi pêşengiya PKK'ê çalakîyên wan li her derê belav bûbûn. Di qêrînên wan de serhildaneke nû, xebateke nû ya siyasî-çandî dihatê hiskirin. Ji ber ku pirraniya gel aligirên PKK'ê bûn hinek ji wan stranbêjan jî him jî berhestên xwe yê Kurdperweriyê, him jî ji ber berjewendiyên aborî ketibûn nava xebatên hunerî. Atmosfereke wisa xweş û rihet çêbûbû ku pêre li dijî sistema Kemalîstên inkarker wêrekiyêke mezin jî dabû civakê. Hêza herî dînamîk a civakê ciwanên Kurd bûn û bi rewşê re êdî hezaran kesan berê xwe da çiyayên Kurdistanê yan jî ketin nava kar û barên siyasî li Bakurê Kurdistan û Tirkîyê.

Reng û rûyê xwe bi xelkê dane nasandin

Murat Bektaş, Şehribana Kurdî, Kazo, Canê, Xezal û Delal, Fatê, Beşîr Kaya, Şiyar Farqînî û çendîn kes, kom û navendên din yê hunerî di wan salan de reng û rûyê xwe bi xelkê dane nasandin. Li rex vana rê li ber belavbûna berhemên hunermendên weke Şivan Perwer, Ciwan Haco û Koma Berxwedan jî hate vekirin ku berhemên wan li Tirkîyê û Bakurê Kurdistanê bêne belavkirin. Berhemên ku xelkê wan salan bi dizî jî li wan guhdarî kiribûn û bandora xwe li ser nîfşê nû jî hebû.

Pêşwaziyeke wiha germ û zêde li pey wê siyaseta înkâr û bişaftina tevahiya taybetmendiyên neteweyê dêrîn di nava sinorên dewleta Tirkîyê da dihat ku têhnîyên azadiya xwe bûn. Mafên wan ên meşrû hatibûn binpêkirin. Dengê şoreşa PKK'ê ku di warê hunerê de xwedî stratejiyekê cuda jî ya dewleta serdest û dagirker bû, êdî bi rêya hunerê jî digîha her derê. Karê ku êdî jî destê Enqerê jî derketibû û sedemeke mirina tije goman a Turgut Ozal jî bi vê yekê ve girêdayî tê dîtin.

Dengê wî sinor derbas kirin!

Di wan salan de tevî ku Murat jî temenê biçûkatîyê li gel çend kesên jî malbata xwe stranên dewata digotin, lê êdî bi hatina pêvajoya nû re dengê wî zû sinor derbas kirin û zêde jî jê hate hezkirin. Sedemên vê yekê gelek in, lê dengê wî yê bilind tevî hostatiya di stirîn û awayê vegotina peyvan de hebû, dikir ku herkes li wî guhdarî bike. Zêdebarî vê yekê, bi Kurdî jî baş dizanî û hinek jî zêdetir ji temenê xwe û xebatên xwe yê hunerî şehrezayî stranên folklorîk û dilanê bû. Evîndarê deng û stranên hunermendên weke Hesen Cizîrî, Şivan Perwer, Xelîl Xemgîn, Seîd Yûsîf, Mihemed Şêxo û dengbêjên herêma xwe bû. Mînaka vê yekê dema ew stranên: Xezal-Xezal, Kevok im, Mihemedo, Oy Felek, Eman Dilo bi wayê hunermendên navbirî teqlîd dike, êdî hûnê baştir bi hestên wî yê hunerî û hostatiya wî ya stranbêjiyê bihesin. Di Newroza sala 1997'an de dema Xezal-Xezal digot, salon wisa tije bû û xelkê jî hev



Kurtejiyana Murat Bektaş

Tenê 35 salan jiya û li gorî gotina birazayê wî Serdar Aktaş di roja 25'ê Tirmeha sala 1965'an de li taxa Gazîler a Amedê hatiye dinê, lê malbat bi eslê xwe ji gundê Bafawa (Kayadere) yê ser bi Stewrê li wilayeta Mêrdînê ya Bakurê Kurdistanê ne. Heza wî ji zarotiyê stirîn û hînbûna amrazê sazê bûye. Malbatê jî dizanî ku paşeroja wî tenê dikare bi rêya strangotîyê di nava dawet û şahîyan da bidome. Sedem jî him korbûna wî ya zikmakî û him jî heza wî a bêdawi jî strangotîyê bû.

Murat ji zarotiyê kesekî bédeng lê dema kete yazdeh saliya xwe, mandibûn li cem wî bêwate bû, dikarî di demekê de hezaran kesa rake ser piyan û dilana du gundan bi hev re bigerîne. Niha jî dema li wî guhdarî dikim, hestên wî dema ku ji kûrahiya dilê xwe diqêrîne û stranên diwankî dibêje, Hesen Cizîrî bi bîra min tîne.

Zarokekî jîr bû!

Hema zû di temenê 7 saliyê de cara yekê bi hezeke mezin xwe hîni lîxistina amûrê tembûrê dike û êdî dengê wî di pirraniya saetên rojê de ji ser eywana mala wan a li Gazîler a Amedê tê bihistin.

Navê dayîka wî Emîne û babê wî Ebdulkerîm (Kerîmo) e. Ji 5 zarokên malê Mûsa (Remezhan) û Emîn tevî Murat di karê huner de aktîv bûn û navê komê jî li ser navê Murat Bektaş bû. Organîzatorê bernamêyên wî Emîn bû ku pê re li keyboardê dixist. Bi awayekî siruştî dema tê dinê, her du çavên wî kor in. Sala 1974'an komeke strangotîyê ava diikin û li gundên derdora Mêrdîn, Dilok û Amedê pirrî caran beşdarî dawetan dibin. Hingî gelek caran jî ber ku stranên Kurdî dibêjin, tene girtin, lê ew neçar in ji daxwazên xelkê re jî bibin bersiv dema ku ji wan daxwaza stranên Kurdî dikin. Di 23 saliya xwe de bi keçeke Kurd a bi navê Fikriye re zewicî û du zarokên wî, Rûken û Sedat hene. Lê di nava endamên malbatê da Serdar Bektaş yê birazayê wî li ser şopa apê xwe dimeşe û bi stran û kilîpçêkirinê re hevalbendê gelek kesên hunermend e.

Tembûr jê re her tişt bû!

Muratê nûciwan dema jî radiyo Bexdayê dengê Tembûra Mihemed û Hesen Cizîrî dibihîst, zêdetir hestên wî yê hunerî bişkiwîn. Ji ber wê jî evîna wî ya yekê di cîhana huner de bi tembûrê dest pê kir. Ew di jiyana xwe ya kurt û pirrbar hemûyî de bi tembûra xwe re mirovê herî rûrast bû. Weke evîndarekî wefadar ku eşqa Ferhad û Şîrîn bi bîra me tîne. Êdî tevî wê çeka ku tim tiliyên wî li ser tîlên wê dilistin, wî zarokê jîr û dengxweş roj jî roja berê zêdetir, di warê hunerî de xwe bi pêş dixist. Carna bi saza xwe re diçû ber çemê Dicle û tevî herikîn û xuşexuşa ava çemî, stranên xerîbiyê digotin. Feqiyê Teyran bi bîra wan kesan dîani ku bédeng li dora wî sekinî yan jî rûniştibûn, lê wisa di nava çiroka stranê de wenda dibû ku haydarî derdora xwe nedima. Carna li ser bextreşiyên xwe dilorand û carna jî newayên xemgîn jî tîlên saza wî dibarîn û herkes bédeng dikir.

► "Apê min dengekî muzîkal û pîrr xweş bû, lê hevalên wî, ew zû ji bîrkirin û heta hinek stranbêjên hevalên wî jî di hevpeyvînen xwe de behsa wî nakin. Ez nizanim çima?"

'Kesî nekariye mîna Murat Bektaş stranên kekê min bibêje'

Ji ber ku debara malbatekê bi stranbêjiya wî ve girêdayî bû, zû xwe hîni lîxistina înstûrmentên weke Mandolîna, Dûdik, Flot, Baglama, Akordiyon û Udê jî dike. Bêrawestan û westan bi çavên girtî, hestên îlahî û guhên vekirî aliyê xwe yê jîrbûnê hingî bi başî eşkere dike ku li her stranê tenê carekê guhdarî dike û êdî jiber li her derê dibêje. Li ser keda wî, hinek kes dibine xwediyê her tiştî, lê ji ber ku tenê pîşeya wî huner e, armanca wî jî xizmeta hunerê Kurdî ya xwedî nasname ye. Di nava civakê de mezin bûbû ku xwedî hunerê rengîn, zimanekî dewlemend û erdnigariyeke sirûştî, delem û dilveker bû. Murat di nava jiyana hunerî de pijiyî û kemilî, ji ber wê jî dema saza wî di dest de û xwe li pêşberî gel didît, êdî her kesî bêdeng li wî dinêrî û ruhê wan bi deng û awazên wî re şa dibû.

Qîmeta stranên folklorîk li cem Murat Bektaş jî malê dinê hemûyî zêdetir bû. Di strîna berhemên gelêrî de kesekî profesyonel û bi rêya hinek ji wan berhemên dîrokî zû navê xwe jî li her dera Kurdistanê belav kir. Dema "Eman dilo" ya mamosteyê nemir Mihemed Şêxo distirî, pîsporiya xwe ya stranbêjiyê bi herkesî dida selmandin. Tê bîra min carekê nemir Kenan Şêxo yê birayê Mihemed Şêxo, li Akademiya Kurdî ji min re got, "Kesî nekariye mîna Murat Bektaş stranên kekê min bibêje. Bi taybetî jî dema 'Eman dilo' distire, ez mendehûş dibim."

Ji salên 1990'î û şûnde

Ji sala 1992'yan û pêde jiyana hunerî a M. Bektaş dikeve rûpelekî nûtir. Êdî dengê têkoşîna rizgarîxwaziya Kurdistanê bilind û ew jî di wê pêvajoya nû de hinek erkên taybetî li pêşberî xwe dibîne. Tevlî çalakiyên wan partiyên siyasî dibe ku aligiriya çareseriyê "Pîrsgirêka Kurd" in. Ew ji doza gelê xwe a rewşa dîr û bêhelwêst nîne, lê neçar e ku ji bo debara jiyana malbata xwe jî her hewlê bide. Wan salan di asta herî bilind de dengê wî hingî bêhtir ji dengê pîrraniya stranbêjên Kurd li Tirkîyê û Bakurê Kurdistanê tê bihîstin ku li gel hunermendên weke Fatê û Şehrîbana Kurdî stranên duqûlî belav dikin. Hingî çend berhemên li jêr bavê: "Daweta me (Murat û Fatê - 1/2/3 - 1991)", "Dîlana Kurdî (Şehrîbana Kurdî û Murat Bektaş)" û Potporî (Murat Bektaş û Aynur Dogan) belav dikin ku êdî bi milyon kasetên wan tene firotin. Ji wan wisa tê hezkirin ku carna saziyên dewletê jî wan tehdîd dikin û piştê jî dema meydan li ber wan hate tengkirin, bi pirranî neçar ji Kurdistan û Tirkîyê revîyan û weke penaber hatin Ewrûpayê, lê qedera reş ew derfet neda Muradê bêmiraz.

Ew berhemên wan karekî kolektîv û ji ber ku bi pirranî stranên folklorîk ji çar aliyên Kurdistanê hatibûn destçîn kirin li seranserê welat jî belav dibin û bi rindî tene pêşwazî kirin. Zêde guhdarîkirina li wan berhemên, dibe sedem ku firmayên muzîkê li ser ked û navê wan stranbêjên navdar bibine xwediyê hemû îmkânên jiyane, lê salên piştê M. Bektaş bi feqîrî û nedarî jî jiyane veqetiya.

Berhemên Murat Bektaş

Sedan stranên wî hene, lê bi pirranî folklorî, gelêrî ne û di qada muzîka protestoyî de gelek stranên wî hene.

Ji xeynî stranbêjên navbirî Murat Bektaş tevî gelek kesên din him konsert, him stranên duqûlî û



Serdar Bektaş li ser gora apê xwe

him jî kaset tomar kirine.

Sala 2006'an ji aliyê "Hollywood Music Center" ve albûma Murat û Fatê li jêr navê "Kurdistan-Traditional Kurdish Dance Songs" (Kurdistan-Stranên Dansa Kurdî yê jî rûresmê) li her dera cihanê hate belavkirin.

Qezayeke trajîk

Zû di nava xelkê de hate naskirin, lê zû jî çû. Roja 20'ê Çileyê sala 2000'î dema ku danê evarê ji dawet yan jî konsertekê vedegeriya bi qezaya trafikê ya giran canê xwe ji dest da. Ew çar kes bûn. Qeza di navbera Konya û Aksarayê da çêbû û otomobîla wan li wesayîteke mezin qelibî. Tevî wî, Musa jî jiyana xwe ji dest dide, belê birayê wî Emîn û hevalê wan Filiz Darkiliç bi giranî birîndar bûn û piştê jî nîvşikan (seqet-felc) bûn.

Mezarê wî li goristana Şehîdan a Amedê ye. Tevî hemû hezkirina wî ya dema ku li pêşberî xwe hezaran kes didîtin, mixabin zû jî hate jibîrkirin.

Ezê rêya wî bisopînim!

Serdar Bektaş birazayê wî ye, ew bi salan e ku bi hesreta hunerê apê xwe dijî û dixwaze rêbaza wî dewam bike, lê niha ji ber rewşa malbatî û aborî wî tenê kariye du CD'yan amade bike, lê ew belav nekirine. Ew bi hesret û kelogirî dibêje, "Apê min dengê muzîkal û pîrr xweş bû, lê hevalên wî, ew zû ji bîrkirin û heta hinek stranbêjên hevalên wî jî di hevpeyvînen xwe de behsa wî nakin. Ez nizanim çima?!"

Berhemên Murat Bektaş bi giştî deh berhemên belavkirî ne:

- Baran Barî (1982)
- Oy Nazê (1989)
- Daweta Me (Murat û Fatê - Daweta Me 1/2/3) (1991)
- Dilan (1992)
- Dîlana Kurdî (Şehrîbana Kurdî & Murat Bektaş -1992)
- Cizîra Botan (1993)
- Sipanê Xelat (1994)

- Hoy Mamo (1995)
 - Mem Xunek (1996)
 - Dilo Can (1996)
 - Oy Felek (1997)
 - Şehrîbana Kurdî & Murat Bektaş - Lê Amedê
 - Şehrîbana Kurdî & Murat Bektaş - Koma Dilan
- Ji xeynî wê M Bektaş gelek stranên kilasîk jî ji nûve gotine: Behra Wanê, Bavê Seyro, Kevokim, Lêlê Dayîkê, Lorî-Lorî, Ehmedê Mala Mûsa, Saliho û hwd.

Ew bi wan stranên kilasîk re gelek navên weke Eyşe Şan, Aram Tigran, Hesên Cizîrî û kedkarên din yê mezin bi bîra me tîne.

Hesretên nîvcomayî

Di salên dawîya jiyane de Murat dixwest ji xwe re li Batmanê produksiyon û saloneke mezin a kar û xebatê hunerî bikire, lê wê qezaya malwêran nehişt ku ew bigihe armanca xwe. Wî li ber bû ku bi vekirina cihekî wiha re hevkarîya stranbêjên ciwan bike û berhemên wan tomar bike. Ew kesekî dilovan û xwedî hinek prensîpên civakî bû ku herkesî ji wî hez dikir. Destê hevkarîyê dida gelek kesan. Ji malbatê re sermayeke mezin bû, lê piştê kesî nekari jî mîrata wî re xwedîtiyê bike. Xwezî û hesretên wî nîvco man, lê bi rêya dengê xwe evîna ji hunerê Kurdî re mezintir kir. Murat dengê bi-lind yê çiyayiyên Kurdistanê bû.

(1). https://www.youtube.com/watch?v=-el0w9hjO78&ab_channel=abdullaadil

Têbînî: Hinek zanyariyên taybet li ser jiyana nemir Murat Bektaş min ji keça wî (Ruken Bektaş) standine ku nikarim teva li vir bi xwendevanan re parve bikim, lê xala trajîk ew e ku piştî mirinê, bextreşiyên wî ji zarok û xanima wî re mane. Serdar Bektaş jî di warê huner û xebatê apê xwe de hinek agahî dane min. Ji dil spasdarî wan her du hêjayan im.

Çiya spî bû,
Dayika min pê ra,
Lê çya dîsa
Kesk û sor kir,
Dayik spî ma.

Berla pîrbûne
Bari ser sêrî,
Kesereke kûr,
Hizreteke dîr
Di dil da qerimî...

Elixanê Memê

